


## GOvid-1984

1984 ji bo hemû cîhanê navê romanekê ye ku di her serdemê de pergalên dewlet û birêvebirên wan bi awayekî alegorîkî li ber çavan radixe û 1984 ji bo neteweke weke kurdan ku welatê wan hem ji hêla fizîkî ve... ***Yaqob Tilermenî/R.5***



## Xwebûna barana şevê

Ew çiraya ronak a di hinavê me de dibêje; xwebûn, xwebûn û dîsa xwebûn! Xwebûna ku navê xwe (Xoybûn) daye Serhildana Agiriyê û rojnameya me bi me dide zanîn ku ger em timî eynî tiştî dubare bikin, em nabin 'xwe'... ***Mizgîn Ronak/R.2***



## Du xem

Hevşarederên ku bi milyonan kurd hildibijêrin jî ne rektor in. Tiştên ku li Kurdistanê diqewimin jî ne ew tişt in ku li Bogaziçîyê qewimîne. Vêya bi hêrs dibêjim ji ber ku ev 100 sal in lê ji 2015'an vir ve jî bi awayekî zindîme dît ku zilm... ***Helîm Barîn/R.3***


# xwebûn

18-24 ÇILE 2021 HEJMAR: 57 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Li zindanan û derve heman daxwaz

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ê 21 sal in li girava Îmraliyê tê girtin û şermezarkirina binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyan, di meha duyemîn de ye û li 107 girtîgehan bi israr berdewam dike. Navendên HDP'ê yên Mêrdîn, Şirnex, Riha, Enqere û Îzmîrê, Koordînasoyna Şopandina Greva Birçîbûnê ya ji aliyê ÎHD, TTB, OHD, TÎHV û ÇHD'ê ve hatiye avakirin, ji bo bicihanîna daxwazên girtiyan û piştigiriya bi wan re bang kirin... ***R.3***




## Baweriya civakê bi CoronaVacê nayê

Ewropa, Amerîka û gelek welatên din mehek berê dest bi bikaranîna aşiyê kiribûn û li welatên wekî Amerîkayê jî ji bo teşwîqkirina aşiyê hin siyasetmedaran li hember kamerayan hatibûn aşîkirin. Di nav mehekê de welatên girêdayî Yekitiya Ewropayê ji şîrketên wek BîoNTech û Pfînzerê dozên aşiyê dubare standibûn û ev aşî li van welatan tê bikaranîn. Tirkiyeyê jî di meha kanûnê de 3 milyon dozên aşiya bi navê CoronaVac ji Çînê girtibûn. Der barê vê mijarê de serokê Odeya Bijîşkan a Şaxa Amedê yê berê Mehmet Şerîf Demîr axivî. Demîr diyar kir ku ji bo haya saziyên tenduristiyê û ya civakê ji fazê û xebatên aşiyê de tune ye ewlehî bi CoronaVacê nayê... ***R.7***

## Destpêka nivîsê û aboriya serdestan

Heke şaristanî bi pîvanên qalkirina modernîzmê bê pêşkêşkirin, belê rast e, em civateke şareza nîn in. Ji ber ku dewleta me nîn e, alavên me yên modern û bi destê me çêkirî tune ne, navgînên me yên ku em wek şaheser bidin ber çavan nehatine damezirandin. Vegotin û nivîsên têrgihîştî û giraniya xwe bibin navnîşana pesindayîna me hê nehatine ser maseyên pêşangehan. Her wiha sermayedarên me yên xwedî pere, banke, kargeh, karxane û barxane jî pêk nehatine. Heke hin tişt di nav civata me de hatibin damezirandin jî ne hevtayê welat û civatên modern in... ***Ehmed Pelda/R.7***

## Der barê êzidiyan de du pirtûk

Weşanxaneya Sîtavê der barê dîroka êzdiyan û baweriya wan de 2 pirtûk weşandin. Pirtûkek bi navê 'Dîroka Êzidiyan' ku ji alî John S. Guest ve hatiye amadekirin û yek jî bi navê 'Êzdî û Baweriya Wan' e ji aliyê Dr. Eskerê Boyik ve hatiye amadekirin. Wekî tê zanîn di dîroka dûvedirêj de gelê êzidî, gelek caran bi talan û êrîşên qirkirinê re rû bi rû maye. Gelê êzidî bi baweriya xwe ya êzdayetiyê di nav dîroka xwe ya bi hezar salan de, li ser rêyeke pir dijwar meşiya û di nav astengiyên mezin re derbas bûye. Her şaristaniyê xwestiye şaristaniya beriya xwe... ***R.11***

## Gerek di nav tarîtiya dîrokê de

Gerek di nav tarîtiya dîrokê de Daye Tewrîzî Hewramî, yek ji helbestvan û rewşenbîra yarsan bû. Di pirtûka Serencam de hatiye diyarkirin ku Daye Tewrîz di destpêka sedsala hicrî de, li Hewremanê tê dinyayê. Ewqas ku bi aliyê xwe yê rewşenbîrî, helbest û wêjeyê ve dihat nasîn, ji hêla têkoşîna xwe ya niştîman ve jî bi nav û deng e. Ew di heman demê de yek ji wan jinan bû ku ji bo bawerî û çanda kurdî li hemberî êrîşên ereban biparêze, li dijî êrîşên dijminan têdikoşe.
Yek ji pêşengê baweriya yarsan Baba Serheng, dema ku pê dihese Daye Tewrîz bi destê leşkerên dagirker... ***Zehra Mohammedzadeh/R.2***

# Êrîşkarên Efrîn û Eyn Îsayê yek in



Siyasetmedar Eshed Menan destnîşan kir ku Tirkiye her tim hewl dide Rêveberiya Xweser tune bike û wiha got: "Bi dehan komên çekdar ava kirin û navê Siltanên Osmaniyan li wan kirin. Her wiha êrîşî Efrînê kirin, lê bi berxwedaniya gelê Efrîn û hêzên YPG-YPJ'ê hemû êrîş têk çûn. Ji ber ku Rêveberiya Xweser a Efrînê roj bi roj bi pêş diket û rêveberiyeke demokratîk li ser bingeha biratiya gelan bi pêş dixist, ev tişt bi kêrî dewleta tirk nedihat. Ji ber wê di 20'ê Çileya 2018'an dewleta Tirkiyeyê bi 72 balafirên şer dest bi êrîşê kir. Tevî êrîşên artêşa tirk û çeteyên wê..." ***R.6***

RAMAZAN OLÇEN

## Di bin hukmê dagirkeriyê de... *R.6*

## Kerdeneyê teberê merdimayî pêk yenî

Rojhilato Mîyanênî de hewl yeno dayîş ke Osmanîya newîye bêro awankerdene. Naye rê zî dewlete verkêşî kena. Pirsgirêka tewir pîle verva no hewldayîşî zî şaran ê azadîwaz ê. Seba ke ena mexsedê xo bîyara ca, teknîkanê tewir averkewteyan ê serdeme bikar ana. La belê îradeyê ewladanê şaro kurd hesab nêkerdbî û coka heme planê ê kewt têmîyan. Ê ke verkêşîya xoverdêrîya tarîxî kerd, bêguman ewladê şarê kurd ê... ***Helîn Uzel/R.9***



## Hevseriya çûtaxa te, li para min ket

Dostên xoşewîst, îro, nêvî ji bedena min, bavê zarokên min, mezinê malbata me û birayê we, em bi rê dikin. Bêyî ku em li çep an rastê xwe, li paş an jî pêşiya xwe kesekî bêşînin an jî bêhurmetiyê bikin, bêyî ku em sloganan biqîrin û pankartan vebikin, em bêdeng bi xwepêşandanek a rûmetê radibin.Bi vî rengê bêdengiyê... ***Rakel Dink/R.12***

## Sînemaya kurdî xwe hê nû diafirîne

Der barê rewşa sînemaya kurdî, pirsgirêk û astengiyên li pêşiya sînemagerên kurd de, me vê hejmarê ji bo xwînerên xwe yên hêja bi sînemagerekî kurd ê ciwan re hevpeyvîn kir. Me navê wî ji belgefîlmên "Diyalog" û "Bîra Mi' Têtin" ya li ser komkujiya Roboskiyê, bihîst. Belê mêvanê me derhênerê kurd Selîm Yildiz e. Yildiz wiha dibêje:"Xwezî yekitiya ku sînemaya kurdî pêk tîne partî û rêxistinên kurdî jî pêk bianîna. Ji ber ku di her çar perçên Kurdistanê de derhênerên kurd xizmeta gelê xwe dikin. Di sînemayê de êş û pirsgirêkên me yek in. Ji bo vê yekê em di sînemaya kurdî de cihê xwe digirin. Niha sînemaya kurdî di asteke baş de ye, siberojê jî bi çîrokên xurt..." ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî/R.4***




Zehra Mohammedzadeh

# Gerek di nav tarîtiya dîrokê de

Di tevahiya dîroka şaristaniyê de, çi ji aliyê çand û zanebûn ve, çi jî ji aliyê sazkirinê ve be, jin xwedî roleke pêşengiyê bûne. Mixabin ev rola wê di gelek dem û çaxên cuda yên şaristaniyê de nehatiye dîtin û serfirazî, çand, wêje û zanebûn tenê bi keda mêran hatiye pênasekirin. Tevî ku serdemên berê hin berhem û çavkaniyên jinên pêşeng ên di van qadan de hatine tomarkirin jî em îro rastî navên bi sedan jinên pêşeng tên ku di her bihosteke axa niştiman a rojhilatê welêt de hîn dengê lingê wan tê guh û awaza serkeftina wan nehiştiye ku ev deng bimire.

Di her pêngav û dema dîrokê de, jinan jî mil bi milê zilaman re kar kirine, civak birêxistin kirine, tev li artêşan bûne û şer kirine, ji qadên zanist û wêjeyê de jî kêm nemane û kar kirine. Ji wan jinan yek jî Daye Tewrîzî Hewramî ye ku berhemek mezin, têr û tije li pey xwe hêlaye. Xebat û xizmeta mezin a Daye Tewrîzî Hewramî ji bo çand, wêje û zimanê kurdî çêbûye. Mirov dikare bibêje bi roleke pir mezin rabûye ji bo parastina zaravayê kurdî hewramî (bi taybetî dema ku mirov roja îro helandin û asîmîlasyona li ser vî zaravayî binirxîne), ev zaravayê kurdî zindî hiştiye, parastiye. A girîngtir jî li gel ziman di wêjeya kurdî ya li rojhilatê Kurdistanê jî bi roleke di asta şoreşê de rabûye. Ev berhemên wê di roja me ya îro de jî bi eleqe û baldariyeke mezin tê xwendin û lê tê kolan.



Daye Tewrîzî Hewramî, yek ji helbestvan û rewşenbîra yarsan bû. Di pirtûka Serencam de hatiye diyarkirin ku Daye Tewrîz di destpêka sedsala hicrî de, li Hewremanê tê dinyayê. Ewqas ku bi aliyê xwe yê rewşenbîrî, helbest û wêjeyê ve dihat nasîn, ji hêla têkoşîna xwe ya niştiman ve jî bi nav û deng e. Ew di heman demê de yek ji wan jinan bû ku ji bawerî û çanda kurdî li hemberî êrîşên ereban biparêze, li dijî êrîşên dijminan têdikoşe.

Yek ji pêşengê baweriya yarsan Baba Serheng, dema ku pê dihese Daye Tewrîz bi destê leşkerên dagirker ên ereban tê kuştin, diçe çiyayên Hewremanê û kurdên yarsan birêxistin dike. Yanî ew ev çend di nav civaka xwe de bibandor bû ku hem hebûn û hem jî mirina wê rê li birêxistinkirina civaka yarsan û parastina wan vedike.

Daye Tewrîz li gel pênûsa xwe ya bisihr, pir xweş helbest dixwîne, her wiha yek ji wan kesan e ku tembûrvan û kilambêjeke xweş bûye jî.

Ew yekem helbestvana jin e ku helbestên wê dikevin nav pirtûka Serencam. Ji wê berhevokek ji du beytan ku di pirtûka bi navê "Dema Baba Serheng" de ye dimîne.

Daye Tewrîzî Hewramî di sedsala 14'an a hicrî de koç dike.

**Nimûneyek ji du beyta Daye Tewrîz:**

*Razin peyalem, razin peyalem*
*Sersamem nebezem razin peyalem*
*Badî peyalem yawa venalem*
*Çûnke nalekem berz bî nealem*

**Di van du beytan de Daye Tewrîz dibêje;**

Di roja ezel de ku hemû bendeyan peyman girêdan, ji cihek nediyar tasek ji min re hat dayîn û ez ji kombûna yaran li cemxaneyê heyran mam, ji ber ku ew her demê li pey fikra bidestxistina razê ne û li pey hemû razan bajêr digirin. Çi baş ku ew bi hawara min giha ku di kûrahiya qedeha min de bû ku wiha nalînên enderûnê min qenc kir. Ji ber ku nalîna min hemû cîhan dabû ber xwe, hundirê min aram û baş kir, hemû ji xewa xefletê hişyar kirin û vexwarina qedeha "badey" kêmek ez aram kirim hinek nalîn û pêta di hundirê min de kêm kir.

Di du beytên Daye Tewrîz de gelek gotinên mîstîk hene. Bêguman ev gotin di dema kevnar de di helbestên helbestvanên kurd û fars de pir dihatin bikaranîn. Helbet her yek ji van gotinên mîstîk xwedî wateyeke kûr bûye.

**Daye Tewrîz Hewramî di du beyteke xwe ya din de jî wiha dibêje;**

*Cem pey rasanen, cem pey rasanen*
*Yaran yaveran, cem pey rasanen*
*Herkes nîwe key, ker û asanhen*
*Cem pey rûşenî, zîl xasanen*

**Wate:**

*Hatina ba hev ya yaran li cemxaneyê*
*Karê kesên rast û yaran e*
*Yar û yaveran!*
*Kombûna di cemxaneyê de karê bawermendan e*
*Her kesê ku başiyê bike*
*Karê wî bila hêsan be*
*Û ev civat ji bo mirovên ku rûnî bûne û di kûrahiya dil de bawermend*
*Û kesên xwedî xwezayek baş in*

Li gor baweriya yarsan û her wiha pirtûka Serencam, her hefte gelê yarsan dibû li cemxaneyê kom biban da ku helbestên Serencam bibihîzin û bixwînin. Di destpêkê de pîr an jî rêber li tembûrê dixe û bi dengê bilind çend du beytên vê pirtûkê dixwîne, dûvre hemû kesên di civatê de wê dubare dikin.

Li ber vê çendê ye ku Daye Tewrîz di du beytek xwe de wiha bang bike: Li cemxaneyê kombûn ji bo pakî û rastbûna mirov e.

*Zîl keran revşen, zîl keran revşen*
*Yaran we xore, zîl keran revşen*
*Serseperde ban, we yarî weşen*
*Besazen perî wîtan yûw çeweşen*

**Wateya vê du beytê:**

*Dilên xwe ronî bikin*
*Dilên xwe ronî bikin*
*Yaran, bi tîrêjek îlahî*
*Dilên xwe ronî bikin*
*Û xwe bispêrin vê rêûresma pîroz*
*Ku ev baweriya îlahî çendî baş e*
*Û ji bo pêşeroja xwe kirasek ji zirx çêbikin*

Belê wek her carê me hewl da gerekê di nav rûpelên dîrokê de bikin, xwe kêm û lewaz be jî bigihînin dengê lingê jinên qehreman ên civaka kurd, bibin şopdarê rêya wan da ku bikaribin a wan heq kiriye, bigihînin encamê. Ger gera me carnan kêm û nebes bimîne jî, ji ber agahiyên kêm û berhemên van şepalan kom nehatine tomarkirin, lê ya me jî hewldanek lêgerînê ya bi çîrûskên mûmê dimîne ku di nav tarîtiya dîrokê de li pey şopên berze ye...

# Jinên Tûnisê di warê lêkolînên zanistî de li pêş in

Li gorî daneyên Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) yên sala 2020'an ji aliyê lêkolînên zanistî ve Tûnis di nav welatên Afrîka û erebî de di rêza yekem de ye. Li gorî daneyên UNESCO'yê cara duyemîn e di nav welatên Afrîka û erebî de jinên Tûnisê derdikevin pêş. Femînîstên tûnisî dihesibînin ku serkeftin encama veberhênana dewletê ye ku xwendina bilind û lêkolînên zanistî derxistine pêş.

Li gorî hejmarên Rêxistina Milkiyeta Rewşenbîrî ya Navneteweyî di 2018'an de Tûnis di lêgerîn û nûjeniyê de rêza 66, di hêla weşanên zanistî de 14 û li cîhanê der barê nîşanên hilberîna zanistî de di rêza 43'yan de ye. Malbatên tûnisî berovajî civakên ereb keçên xwe teşwîqî zanistê dikin.

Seroka Navenda Navneteweyî ya Lêkolînên Ewlekarî û Leşkerî li Tûnisê Bedira Qeilûl wiha dibêje: "Di warê lêkolîn û nûjeniya zanistî de bêyî destkeftiyên navneteweyî yên jinên tûnisî bêpar nemane, di warê lêkolînên zanistî de jî hebûna wan a berbiçav heye. Ev nûbûn hişt ku sala welêt di gelek forûmên navneteweyî de bilind bike, her wiha gelek zanyar û derhênerên jin bi saya destkeftiyên xwe yên navneteweyî bûne stêrk."

Her wiha Bedira Qeilûl wiha got: "Ya ku jinên tûnisî bi dest xistiye serbilindahiya hemû jinên ereb e. Hîn berî şoreşên bi navê 'Buhara Ereban' jî Tûnis xwedî pîvanek serxwebûn û azadiyê bû ku ji welatên erebî yên din cudatir bû."

***Çavkanî: Ajansa NÛJINHA***



Mizgîn Ronak

# Xwebûna barana şevê

Ji me re qala çi dike? Vê barana ku xwe li reşahiya şevê veşartiye bi pistepist behsa kîjan heyamên borî û rojên hatî dike? Xuya ye ku li vê dûrahiyê û li wê nêzîkatiyê li hin tiştan digere, bi destên xwe yên nebûyî her tiştê dipelîne. Li vê rêwîngiya me ya bê serûber temaşe dike, bûyîn û nebûyîna me ya bi hev re li hin deran dinivîsîne. Tu dostek bo me bi qasî baranê kevn û bi qasî baranê nû nîn e. Her car hesteke din çêdike, bi me re huznek din, çîrokek din lê niha di vê paşnîva şevê de ya dibare ronakbûyîn e, dizanim... Ew çiraya ronak a di hinavê me de dibêje; xwebûn, xwebûn û dîsa xwebûn! Xwebûna ku navê xwe (Xoybûn) daye Serhildana Agiriyê û rojnameya me bi me dide zanîn ku ger em timî eynî tiştî dubare bikin, em nabin 'xwe' û nagihîjin xwebûnê!

Di lênûskên min ên esîrgirtî de risteyek wiha hebû: "Kux-kux-kux! Welato em bi werema tekrarê ketine/kuxte-kuxta me ji ber vê ye." Helbest dirêj e lê tenê ev riste li bîra min mane ku lênûskên xwe rizgar bikim dê ev helbest jî karibe bigihîje ber destên cenabê we. Lê niha tirsek wiha di ber min re şirifî (çirifî di wateya tuydu ya tirkî de ye "tuymek" jî şirifîn e dibêjim ku gere ev gotina kevnar jî winda nebe.) Heft meseleyên hirçê hene, her heft jî li ser hirmiyê ne.

Dapîra min a zana wiha digot. Heft mesele lê heman naverok. Çîroka hirmiyê! Ecêb e ne? Îja ev tirsa ku xwe şirifand û çû digot qey hûn ê ji bo min vê tiştê bêjin: "Te jî wek hirçê kir lê! Heft meseleyên te jî li ser lênûskan e..." We gotibe jî negotibe jî mala we ava lê jixwe way min got. Niha baranê xuşînî zêde kir ka em guhên xwe bidin wê û xwebûn an jî xwenebûna xwe di ber çavan re derbas bikin. Hozanek dibêje "ne dema ku zarok e hemsal e/ne dema ku mezin e hemta ye."

Ez wekî şexs vê risteyê jiyam, dijîm. Lew dema ku zarok bûm, hevalên pîra min, pîrejinên derdorê hevalên min bûn û pir sebra me bi hev dihat lê niha jî ez hemtayê zarokan im, ne yên hemsalên xwe. Mînak niha ez; jiyan û demê bi dil û hişê Elenda me ya heftsalî dibînim! Xeyalên wê dibin ên min, kelecan, zanîn û keşifheziyên wê... Her ku xwe diqefêlim jî dibînim bi xeyal û rastiyên wê yên lîstokane re dimeşim. Belkî vê rewşê hinek ji bêdemiyê jî tê. Wekî ku tu caran di nav dema xwe ya rastîn de nebûm, timî geroktiya li derdorê yan jî firyariya ji hin tiştan.

Ger hûn bêjin; "mijar cidî ye, xwebûn e; tu çûy di ku re derketî jî..." Nebêjin. Da ku ez jî cewaba xwe ya hazir pêşkêşî we nekim. Ma jixwe xwebûn ne wekî rozetên polîsan wetar (sabît) hişk û rût e, ne jî wekî avahiyek temambûyî ye. Xwebûn; bûyînek bêdawî ye ku wiha nebe dê nasnameyên kesanî, civakî, neteweyî, polîtîk û dozdar; bi herikîna robarê demê re û ji ber robarê demê kevin bibin biqetin, wate û nirxên xwe winda bikin, dikin jî.

Gelek şoreş hene ku nasnameya xwe xwarine û bi wan nasnameyan bûne gur û çeqel li hemberî azadî û xwebûnê (mînak Çîn) jixwe ferqa xwebûna azad û azadîxwazan a ji zordest û zordestîxwazan jî di vir de xwe nîşan dide. Li gorî wan, her tişt xwedî buhayek firotin û tapûyek e û ev yek bi mekanîzmayên pêşkêşkirin û dewletan jî tê morkirin lê ya me newisa ye! Bêqeyd û bend bê tapû, mohrkirin bi cewhera xwezayî ya netebat diherike her tişt. Her wiha wekî gotina hozan, bi awayek makro wekî gel jî ji bo me rast e! Lew kurd jî tu car wekî hemta û cîranên xwe wekî dinyayiyên din nebûne; bi wan re di heman dem û çarçoveyê de nejiyane, carna dereng mane, carna jî zû kirine ji her tiştî re. Belkî ev yek jî ji bo xwebûnê bibe bingehek baş; ango binyatek serbixwe û neçarçovekirî ku baş were honandin. Çima nebe xwebûnek azad û dilşad?

Belê barana şevetarî dibêje; bila heft çîrokên we hebin û her heft jî li ser xwebûnê bin. Bê kulîlkên xwebûnê nemînin!

# Grev dikeve meha sêyemîn

Navenda Nûçeyan

**Çalakiya greva birçîbûnê ku ji bo tecrîda li Îmraliyê bi dawî bibe hatiye destpêkirin didome. Li Amed, Şirnex, Mêrdîn, Riha, Îzmîr, Enqere, li gelek bajaran çalakiyên piştgiriya grevê hatin lidarxistin**

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 21 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Ewlehiya Bilind a Tîpa F tê girtin û şermezarkirina binpêkirinên mafên mirovan ên di girtîgehan de zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyan, di meha duyemîn de ye û bi israr berdewam dike.

Li kampa Mexmûrê ya girêdayî Herêma Federal a Kurdistanê jî, li dijî tecrîda li Îmraliyê, bi pêşengiya jinan di 18'ê kanûnê de, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakiya li Komeleya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê dewam dike, di hefteya 5'emîn de ye.

Welatiyên li kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî, ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Ocalan û piştgiriya bi çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan didome, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê û Navenda Çanda Kurdistanê hat destpêkirin, di hefteya 3'yemîn de ye.

Tevgera Jinên Azad (TJA) der barê tecrîd û çalakiyên grevên birçîbûnê yên li girtîgehan, li ber Bîrdariya Mafên Mirovan a li Parka Koşûyolû ya navçeya Rêzana Amedê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ji raya giştî hat xwestin ku guh bidin daxwazên girtiyan.

**Li gelek bajaran çalakî**

Navendên HDP'ê yên Mêrdîn, Şirnex, Riha, Enqere û Îzmîrê bi armanca piştgiriya bi çalakiyên greva birçîbûnê re çalakî li dar xistin. Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay, rêveberên rêxistinên bajêr û navçeyan û Dayikên Aştiyê tev li çalakiya li navçeya Nisêbîna Mêrdînê hat lidarxistin bûn. Di çalakiyê de, pankarta "Tecrîd sûcê mirovahiyê ye, ji tecrîdê re êdî bese" hat vekirin.

HDP'a navçeya Silopî ya Şirnexê, der barê çalakiya greva birçîbûnê de li ber avahiya partiyê daxuyanî da çapemeniyê. Hevserokê HDP'a Silopyayê Kadîr axivî û got ku îro xwedîderketina li girtîgehan berpirsiyariyeke exlaqî û wijdanî ye. Parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Nûran Îmîr got ku divê hikûmet guh bide daxwazên girtiyan.

Bavê girtî Veysî Mîran Işik ê ku li Girtîgeha Tîpa D a Amedê, di çalakiya grevê de ye, Ramazan Işik diyar kir ku daxwazên girtiyan hiqûqî ne û xwest daxwazên wan bên qebûlkirin.

Li Girtîgeha Turkoglû ya Gurgumê ya Hejmar 1 a Tîpa L'yê girtî Baran Gul telefonî malbata xwe kir û binpêkirinên mafan ên li girtîgehê ragihandin. Gul ragihand ku gardiyanan avêtiye ser qawişên girtiyên ku li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ne û êrîş birine ser hevalên wan.



**Daxwazan qebûl bikin**

Koordînasoyna Şopandina Greva Birçîbûnê ya ji aliyê ÎHD, TTB, OHD, TÎHV û ÇHD'ê ve hatiye avakirin, bi armanca rakirina tecrîda li Îmraliyê ya ku girtiyên siyasî ji bo bidawîkirina wê ketine greva birçîbûnê, bi dawî bibe li Enqereyê daxuyanî dan û bang li wezîrê dadê kirin ku gavên şênber bên avêtin û tecrîd bi dawî bibe.

Parlamentera HDP'ê Gulistan Kiliç Koçyîgît têkildarî grevan li meclisê daxuyanî da û wiha got: "Pergala Îmraliyê di tu pergalên hiqûqî de tune ye. Tecrîd işkenceya herî giran e. Em bang li hemû raya giştî ya demokratîk dikin ku bibin dengê girtiyan."

# Îdianameyeke dirêj e lê viqûvala ye

Hevserokên HDP'ê yên berê Selahattîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag jî di nav de der barê 108 siyasetmedaran de bi îdiaya "Bûyerên Kobanê" îdianameya Kobanê hat amadekirin. Di îdianameyê de der barê siyasetmedaran de bi hezaran sal cezayê girtîgehê tê xwestin.

Cîgira seroka koma HDP'ê Meral Daniş Beştaş anî ziman ku 7 sal in li ser îdianameya Kobanê dixebitin û wiha got: "Di encamê de vê îdianameya dirêj amade kirin. Hejmara rûpelên wê zêde ne lê belê dema em di aliyê naverokê de lê dinêrin viqûvala ye. Di naverokê de delîl tune ne. Sûc nehatiye pênasekirin. Tenê di îdianameyê de nûçeyên rojanameyan, agahî û belgeyên kevn hene. Îdianame ji van hêmanan pêk tê. Metnek ku di warê hiqûqî û îdia tê de cih bigirin nîne. Bi tevahî şîrove ye. Heta bêyî ku hewceyî bi şîroveyê bibînin, 750 rûpel navê lîsteya muştekiyan e. Karûbarên divê polîs bikin jî wek dane di îdianameyê de bi cih kirine." Beştaş diyar kir ku îdianameya Kobanê ne metnek hiqûqî ye, argûmana tasfiyekirina kurdan a ji siyasetê ye û ya ku were darizandin ne HDP ye, AKP ye. ***ENQERE***



## Rêyên gelek gundan hatin girtin

Li Colemêrg û navçeyên wê ev çend roj in berfek zêde dibare. Ji ber berfa zêde li Navenda Colemêrgê rêya 21 gund û 47 gundikan, li Navçeya Şemzînanê rêya 18 gund û 69 gundikan, li Navçeya Geverê rêya 57 gund û 77 gundikan bi giştî rêyên 289 gund û wargehan hatin girtin. Ji bo vekirina rêyên gundan xebat hatin destpêkirin. ***COLEMÊRG***

## Girtiyê nexweş ê 83 salî dîsa bernedan

Danişîna doza Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî ku 24 sal in girtî ye, li 7'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Edeneyê hat dîtin. Ozkan ji ber temenê mezin û nexweşiyê nekarîbû tev li danişînê bibe. Parêzerê Ozkan tev li danişînê bû. Parêzeran bal kişand ser temen û nexweşiyên Ozkan û xwest Ozkan bê berdan, lê heyeta dadgehê daxwaza parêzeran red kir û biryar da ku Ozkan dîsa girtî bê darizandin. Heyetê bi hinceta doza li 1'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Îzmirê ya têkildarî doza Lîcê bi encam nebûye, biryar da ku Ozkan girtî bê darizandin. Heyetê danişîna doza Ozkan taloqî 6'ê gulanê kir.




Mehmet Emîn Ozkan, ji kuştina Tuxgeneral Bahtiyar Aydin a sala 1993'an berpirsyar hat girtin û cezayê muebetê lê hatiye birîn. Ozkan 24 sal in girtî ye. Ozkan, li gel ku nexweş e û rewşa wî giran e jî nayê berdan. ***EDENE***



Helîm Barîn

# Du xem

**•Zanîngeha Bogazîçiyê û şaredariyên kurdan**

Mirov her dixwazin tiştan bişibînin tiştên ku bûne fenomen û bi vî awayî jê fêm bikin. Di qada mantiqê de navê vê rêbazê analojî ye. Şibandina navbera tiştên ku taybetiyên wan ên hevpar hene analojî ye. Ev rêbaz pirî caran bo perwerdeya zarokan an jî bo girseyan tê bikaranîn. A rast ger baş bê bikaranîn, rêbazeke bikêrhatî ye û perwerdeyê hêsantir û kêfxweştir dike, lê hûn jî dizanin, timî rîsk û xetereyên tiştên hêsan hene. Li ser meselê dema em dibêjin 'Ehmedê Xanî Shakespeareyê kurdan e' em dixwazin bibêjin, 'Shakespeare nivîskarekî pir mezin e'; wê caxê 'Ehmedê Xanî jî nivîskarekî pir mezin e', lê referansa mezinbûna Xanî ji berhemên wî bêtir dibe nivîskarek din. Versiyonên vê klîşeyê, biborin, analojiyê wiha berdewam dikin: "Şakiro Pavarottiyê kurdan", "Delîla, Sezen Aksuya me" , "dengbêjî operaya kurdan"… Êş û berxwedanên me jî dibin muxatabê vê mantiqê: "Helepçe Hîroşîmaya Rojhilata Navîn e.", "Kobanî Stalîngrad e"… Muavînên otobusan jî vê rêbazê bi kar tînin: "Dogunun Parîsî, Diyarbakira hoş geldiniz"… Helbet çapemenî û medyaya civakî jî ji tiştên wiha hez dike. Nivîskar bi qasî du rûpel axiviye lê teqez ew ê sernivîs bibe "filan kurd, filan biyaniyeke kurdan e". Erê, van şibandinan bayeke hênik li egoya me ya neteweyî dixin lê ev çolbira hêsan gelek caran tevliheviya fêmkirinê derdixe. Fêmkirinê kûr nake û nîvco dihêle. Pirsgirêkek hunerî, çandî, polîtîk di asta magazînê de dihêle. Di ser de jî analojî şaş bê avakirin zanîneke çewt pir zû di nav civakê de weke heqîqet belav dibe. Ji ber vê yekê ger analojî bê bikaranîn divê cudahî û hurgiliyên wê jî bên zelalkirin.

Di vê çarçoveyê de hêja ye ku mirov li ser mînaka şibandina tayînkirina antîdemokratîk a rektorê zanîngeha Bogazîçiyê û qeyûmên ku dest danîne ser şaredariyên Kurdistanê birame. Helbet li hemberî vê desthilatiyê parvekirina cerebeyan û pê re jî avakirina xeta berxwedana hevpar grîng in, lê berxwedana hevpar nayê maneya ku hemû rewş yek in an jî dişibin hevdu. A yekemîn li Kurdistanê ji tayînkirina qeyûman bêtir rêveberiya şaredariyan hatin betalkirin. Hemû îmkan û hêza şaredariyan ket destê qeymeqam û waliyan. Mirov dikare bibêje bi awayekî defacto li Kurdistanê piştî 2016'an modela rêveberiya şaredariyan nema. (ji xeynî ji adarê heya tebaxa 2019'an)… Ev yek grîng e ji ber ku li welatekî hebûna şaredariyan îşareta demokratîkbûnê ye. Tunebûna wan jî berovajî îşareta desthilatiya antîdemokratîk e. Ev yek bo rewakirina berxwedanê li qadên navneteweyî grîng e. Her çiqas niyeta şibandinê ne xerab be jî mirov dixwaze destnîşan bike ku Kurdistan ne zanîngeheke tirkan e. Hevşarederên ku bi milyonan kurd hildibijêrin jî ne rektor in. Tiştên ku li Kurdistanê diqewimin jî ne ew tişt in ku li Bogazîçiyê qewimîne. Vêya bi hêrs dibêjim ji ber ku ev 100 sal in lê ji 2015'an vir ve jî bi awayekî zindî me dît ku zilm û kuştin û qetlîam, girtin û talan, hema em dikarin bibêjin ku li mêtingeyekê çiqas tiştên xerab biqewimin li Kurdistanê qewimîn. Qeyûmên dewletê bi vê pergala mêtingeriyê ve girêdayî ne. A duduyan, rast e ev analojî rewşa Bogazîçiyê baştir vedibêje û mesele çiqas giran e dide fêmkirin lê li aliyê din rewşa qeyûmên şaredariyan tevlihev dike. Ger meseleya qeyûman ji vê pergala mêtingeriyê qut bê nîqaşkirin an jî bi meseleya rektorê Bogazîçiyê ve bê şibandin ew ê tam jî tiştên ku me li jor bo analojiyan got biqewimin yanî ew ê fêmkirinê nîvco bihêle.

**•"Life Isn't A Quiet River"**

Di sedsala 18'emîn de rewşenbîr û hunermedên yewnanan ji zilma osmaniyan reviyan û berê xwe dan Ewropayê… Lê li wir bobelatek mezintir hat serê wan. Li wir ketin bin desthilatiya estetîk û çandî ya Ewropayê. Çand û estetîka otantîk a yewnanan ber bi çand û estetîka Ewropayê ve hat bişaftin. Em vegerin îro; di sedsala 21'emîn de rewşenbîr û hunermedên kurd ji zilma osmaniyan direvin û berê xwe didin Ewropayê… Lê li wir bobelatek mezintir tên serê wan… Zehra Dogan rojnamegerek jêhatî bû. Hat girtin. Li zindanê weke her hevalên xwe li ber xwe da. Ji zindanê derket. Çû Ewropayê. Li Ewropayê karên baş kir û hîn jî dike. Li platformên navneteweyî bi axaftin û hunera xwe karê dîplomasiyê jî dike. Her çiqas tarza wê ne bilê her kesî be jî bi hunera xwe hewl dide ku berxwedana xwerêveberiyan neyên jibîrkirin. Wana giş baş in xweş e lê ev çi fîlm e? Ji ewqas êş û çîrokên zelal û şênber fîlmeke wiha ne zelal û bi metaforan dagirtî çawa derdikeve! Berhem tiştan dibêjin. Çawa wêneya te got ev aqrep dupişk in, wiha tiştan dibêjin, lê ev fîlm çi dibêje ez fêm nakim. Ji ber ku krîzek navxweyî ya bûneweriyê li Ewropayê heye berhemên wan jî tevlihev in. Ne zelal in. Nîvco ne. Ji ber wê jî berxwedana zelal a kurdan bala wan dikişîne. Çawa Nietzsche xwe avêtibû bextê Zerdeştî, rewşenbîr û hunermedên Ewropayê jî dema têkoşînek weke tekoşîna kurdan dibînin bo xwe ji vê krîza bûnewerî xelas bikin ber bi vê tekoşînê ve diçin, lê Zehra Dogan bi vê fîlma xwe, xwe bi dildarî tev li krîza hunerî û bûnewerî ya Ewropayê dike. Ev krîz ji ber ku ew ne ewropî ye krîzên "şîzofreniya çandî" jî ew ê bi xwe re bîne. Ji ber wê jî weke pêşniyar silavekê li Daryush Shayeganî bide wê baş bibe.

## DEM DEMA DERHÊNERÊN CIWAN E

# Sînemeya kurdî xwe hê nû diafirîne

Rizoyê Xerzî

*Der barê rewşa sînemaya kurdî, pirsgirêk û astengiyên li pêşiya sînemagerên kurd de, me vê hejmarê ji bo xwînerên xwe yên hêja bi sînemagerekî kurd ê ciwan re hevpeyvîn kir. Me navê wî ji belgefîlmên "Diyalog" û "Bîra Mi' Têtin" ya li ser komkujiya Roboskiyê, bihîst. Belê mêvanê me derhinêrê kurd Selîm Yildiz e.*

**Çîroka te û sînemayê çawa dest pê kir û bandora çi yan jî kê li te çêbû ku te berê xwe da karê sînemayê?**

Min di navbera sala 2007-2013'an de xebatên documentar ên wêneyan dikir. Sala 2013'an belgefîlma min a yekemîn a bi navê 29 Documentary û bi vê docmentarê min dest bi karê sînemayê kir. Ji bo min rêwîtiya 29'an rêwîtiya sînemayê bû. Çîrok ji mirovan bêtir bandora xwe li min dikir. Helbet ev yek ji bo sînemagerên kurd jî û yên mîna min nû dest bi sînemayê kirine dibe wekî refrans.

**Bi rastî ciyê kêfxweşiyê ye ku êdî derhênerên kurd bi xwe li ser kurdan fîlman çêdikin. Berê xelkên biyanî li gorî xwe behsa kurdan dikirin. Di vê der barê de tu çi difikirî û dikarî çi bêjî?**

Em dikarin li vir bêjin ku sînemeya kurdî xwe hê nû diafirîne. Sedema vê ya yekemîn bêdewletî ye. Gelên ne xwedî dewlet di aliyê wêje û muzîkê de serkeftî ne lê berhemên wan ên sînemayê pir pir kêm in. Di cîhanê de gelek mînakên vê yekê hene. Kurd jî dikevin vê kategoriyê. Ji ber ku karê sînemayê karekî dîjîtal û endustrîel e, sînema bi alîkariya dewlet û saziyên mezin dikare bi pêş bikeve.

Wekî mînak derhênerê macarî Bela Tarr, di 16 saliya xwe de dest bi sînemayê kiriye lê me di 16 saliya xwe de nedizanî sînema çi ye. Yanî em evqas nû sînemayê nas dikin. Bi ya min, derfet pir kêm bin jî sînemaya kurdî baş bi pêş dikeve. Têkilî û baldariya li ser sînemayê ango eleqeya bi sînemayê re li ser du xalan mezin dibe. Yek hejmara derhênerên kurd zêde dibe û ya din jî temaşevanên sînemaya kurdî her diçe zêde dibin.

**Belgefîlma te ya bi navê 'Bîra Mi' Têtin' di roja dawî de ji Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Enqereyê bi sedema ku belgeya tomarkirinê tune ye, hat derxistin, gelo ev çi belge ye û rastiya vê meselê çi ye?**

Ji bo qedexekirina belgefîlma min a bi navê 'Bîra Mi' Têtin' , ev qanûneke dewletê ye dibêje tu dê ji min destûrê bixwazî, ger ez destûrê bidim tu dikarî fîlma xwe nîşan bidî. Bi ya mi jî hewcedarî û pêwîstî bi wê yekê tune ye. Fîlmên vê belgeyê nestînin, heke ji bo festîvalên ku dewlet jî destekê dide dîsa jî nîşandana wan qedexe ye. Em jî dibêjin em tu carî destûrê ji dewlet, sazî û rêxistinan naxwazin. Em çîroka kê dikişînîn tenê dikarin destûrê ji wan bixwazin. Meseleya sereke sêwirandina sînemayê ye. Divê sînema serbixwe be. Festîvala Enqereyê jî bi gotina wezareta çandê kir û ew belgefîlm sansûr kir, lê min sond xwar ez gavekê paş de navêjim. Piştî vê bûyerê min deftera Enqereyê girt, heya ku ew vê şaşiya xwe rast bikin.

**Li gorî te heke ku komkujiya Roboskiyê li dadgehê bi encam bûbûya jî dê ev belgefîlma te hatibûya qedexekirin?**

Bêguman, ez ê bibêjim parêzer vê qanûnê ji min baştir dizanin lê wan jî doza komkujiyê tevlîhev kir. Berpirsiyariya min ev e ku ez bi vê çîrokê bîranînekê biafirînim, vê komkujiyê ji bîr nekim û em rê li pêşiya komkujnyên din bigirin. Belkî li Enqereyê 200 kesan fîlma min temaşe bikira lê li ser malperên cuda yên medyaya civakî heta niha li cîhanê zêdetirî 50 hezar mirovan ew belgefîlm temaşe kiriye.

**Madem ku di wan festîvalên dewletê de kurd rastî sansûrê tên, divê hûn rêyeke çawa bidin ber xwe, bi awayekî din hûn çawa dikarin berhemên xwe pêşkêş bikin?**

Bi rastî gelek rêyên din hene û bi salane em vî karî dikin. Cîhana sînemayê cîhaneke berfireh e, tenê Tirkiye ne tê de ye. Wekî mînak dikarim bêjim ku ez bixwe girîngiyê didim festîvalên Ewropayê. Bi rêya wan festîvalan dixwazim van çîrokan bigihînim kesên vî welatî nas nakin. Min ev yek bi fîlma xwe ya dawî pêk anî. Her çiqas hejmara wan kêm be jî li Tirkiyeyê festîvalên me yên alnernatîf jî hene.

**Kurd çima ji fîlman bêtir belgefîlman amade dikin?**

Di beşa documentaryê de tomarkirina rastiyan bi rêya wêneyan ve dibe. Di dever û coxrafyayên wiha bêqanûn de, bandora belgefîlman bêguman baştir e. Divê em barê vê berpirsiyariyê ji bo siberojê bidin ser milê xwe.

**Tu dikarî ji kerema xwe rewşa sinemaya kurdî bi giştî binirxînî, gelo di çi rewşê de ye?**

Sînemaya kurdî hîn nû ye, kêmasiyên wê jî helbet wê hebin. Her çiqas kêmasî hebin jî pêşketinên baş derdixe holê. Ev pêşketin ne tenê ji bo Bakur e, ji bo her çar parçên Kurdistanê ye jî. Ez bixwe dibim şahidê vê yekê. Her sal gelek fîlmên bi kurdî beşdarî festîvalên cîhanê yên girîng dibin û tê de cîhê xwe digirin.

**Têkiliyeke çawa di navbera sînamegerên kurd ên parçeyên din ên Kurdistanê de heye. Her wiha bi giştî tu pêşeroja sînemaya kurdî çawa dibînî?**

Xwezî yekitiya ku sînemaya kurdî pêk tîne partî û rêxistinên kurdî jî pêk bianîna. Ji ber ku di her çar perçên Kurdistanê de derhênerên kurd xizmeta gelê xwe dikin. Di sînemayê de êş û pirsgirêkên me yek in. Ji bo vê yekê em di sînemaya kurdî de cihê xwe digirin. Niha sînemaya kurdî di asteke baş de ye, siberojê jî bi çîrokên xurt, wê derkeve asta herî bilind.


Ez dikarim bêjim êdî di sînemaya kurdî de dem dema derhênerên ciwan e. Ev xaleke gelekî girîng e. Ji ber ku sînemaya kurdî hîn ciwan e û kategoriya derhênerên kurd ên ciwan jî zêde bû.

**Çi proje û xebatê te yên nû hene?**


Demeke dirêj e çîrokek ku mêjî û dilê min mijûl dike, heye. Ez niha wê dikişînim. Ez ê heya çend mehan xelas bikim. Monolog berdewama fîlma 'Bîra Mi' Têtin' e. Fîlma Monolog piştî komkûjiya Roboskiyê, jiyana niştecihên Roboskiyê û jiyana bêedalet a rojane hatibû çêkirin. Her wiha zordariya li ser sînor û hewldana mexdûrên wê herêmê ku tê de dijîn. Piştî Monologê ez ê Monotonê bikişînim. Fîlma min a pêncan Monoton e. Monoton jî çîrokek dûr-nêz e. Şerê li kurdistanê yê 40 salan ê didome û dawiya wî nayê. Ev çîrok jî li ser çend karakterên ku di aliyekî nav şer de kêm tên dîtin an jî qet nayên dîtin. Bi awayekî sînematografîk ez dixwazim bê dîtin û bandoreke mezin li ser temaşevanan bihêle. Yanî Monoton wek çîrokên min ên din ên kêşayî ye; wek wan çîrokên civakî û çîrokên li ser vê axê tên jiyîn.





> Berpirsiyariya min ev e ku ez bi vê çîrokê bîranînekê biafirînim, vê komkujiyê ji bîr nekim û em rê li pêşiya komkujiyên din bigirin. Belkî li Enqereyê 200 kesan temaşe bikira lê li ser malperên cuda yên cîhanê zêdetirî 50 hezar mirovan ew belgefîlm dît




## Selîm Yildiz kî ye?



Sala 1985'an li Miksa Wanê hatiye dinyayê. Salên 2010-2013'an li Zanîngeha Azad a Stenbolê perwerdeya xwe di qada wênê û belgefîlman de dîtiye. Her wiha bi wêneyên xwe tev li gelek pêşangehan bûye. Salên 2012-2014'an li gundê Roboskiyê ji bo 60 zarokan atolyeyeke bi navê 'Baş e ku tu heyî Atolye' vekiriye. Belgefîlmên bi navên '29', 'Bîra Mi' Têtin' û 'Dialogue' kişandine û niha jî belgefîlma bi navê 'Monolog' amade dike.



Okyanûsya veguherîbû êşkencexaneyekê û dîmena wê di serê mirovan de weke bizmarekî hatibû kutandin. Îşarkên qedexeyan, rûpoş, derzîlêdan, ketina dorê li ber sazî û dezgeh û marketan, ajansên nûçeyan, odeyên bijûngehan, tenduristkarên jihaldeketî, navên miriyan, lewçetiyên serwezîr, serkomar û serdewletan jiyan veguherandiye êşkencexaneya derûnî.




Dest û pî bi hev ve hatibûn girêdan, ji mirovên Okyanûsyayê cinawir hatibûn afirandin. Bêkarhiştin, xizanî, birçîhiştin, veguherandina bêtaqetî û bêhêziyê mirov veguherandine keriyekî ku çavên wan her li deriyan e.




Cinawirê bi çavdêran dorpêçkirî hêdî hêdî serên hevdu xwaribûn. Mirovên ji qidûm de ketî, hêdî hêdî çav bera mal û milk û xwirekên hevdu didin.



Li Londona Okyanûsyayê girseya mirovan li ber wêneşanê li hêviya fermana Big Brother in û roj bi roj di nav seqaya tirsê de kedîtir bûne. Li çarnikarê cîhanê girseya mirovan li ber wêneşanên televizyonan îstatîstîkên ji ber nexweşiya coronayê dihejmêrin û roj bi roj bi fermanên birêvebiran bêtir di malê xwe de tên girtin.



Winston Smithê di nav lepên çewisîner de tûşî hemû îşkenceyên xwînxwarî hatibû, li ser piyan mabû û hişê xwe nexwaribû. Li hin derên cîhanê kêm kesên ku bi dijraberiya xwe ji bo azadiya xwe û mirovatiyê hîn li ber xwe didin jî hene.



KitêbXaneya CAB
Yaqob Tilermenî

# GOvid-1984

1984 ji bo hemû cîhanê navê romanekê ye ku di her serdemê de pergalên dewlet û birêvebirên wan bi awayekî alegorîkî li ber çavan radixe û 1984 ji bo neteweke weke kurdan ku welatê wan hem ji hêla fizîkî ve û hem ji hêla hişmendî ve dagirkirî, destpêka hişyarî û lixwevarqilîna neteweyî ye. Bi minasebeta jiyana pandemiya cîhanî, ev dîroka nîşankirî (1984) her carê xwe ji nû ve bi bîra me dixe û em jî dêhn û bala xwe bi baldarî didin serê. Îcar; Covid-19 yanî vîrûsa coronayê ya di sal û nîvekê de cîhan derbasî serdemeke nû kir û GO-1984 yanî George Orwellê ku beriya bi 75 salan bi romanek polîtîk û alegorîkî li cîhaneke dijutopîk mirov bi rêya nivîsê hay ji rastiyên desthilatdarên rêvebirên cîhan û jiyanê çêkiriye, du mijarên têkilhev ên şayanî nivîsandinê ne.


Her ku cîhan pîr dibe, her ku jiyan bi pêş ve diçe û her ku mirov jîr dibin, êş û elemên jiyanî hê berbelavtir dibin. Pê re jî qal û behsên romanên honakzanistî û dijutopîk zêdetir dibin. Ji ber wê mirov li ku dinêre pêrgî teoriyên pelepûçk û sivik tên ku her yek ji wan kompoloyekê dihundirîne. Teoriyên komployî jî dêhn û balê vedigerînin ser cîhanên di romanan de hatine avakirin. Yek ji vana ya herî bêtir di rojevê de, romana George Orwell a bi navê 1984 e ku ji weşandina xwe heta îro li dehan zimanan hatiye wergerandin, şano û fîlmên wê hatine çêkirin, bûye xêzeroman, pey daye nîvîskar û hunermendan û di jiyanê de adapteyî gelek performansan bûye, lê bibîrxistina wê hê jî bi dawî nehatiye. 1984 bi minasebeta nexweşiya coronayê dîsa aktuelbûna xwe bi me daye hesandin.

Ez li vir dixwazim behsa dîsîplîneke dîtir a têkîldarî romana 1984'an bikim ku ji aliyê Antonio Saura (Huesca 1930- Cuenca 1998) ve hatiye afirandin.

Antonio Saura, di sala 1947'an de li Madrîdê ji ber nexweşiya jana zirav bi qasî pênc salan di nav nivînan de maye û di vê maweyê de dest bi nivîs û nîgarkirinê kiriye. Di serê salên 1950'yî de li Parîsê piştî xebatên 'weke xewnan' û wêneyên surrealîstî, bi şêweyeke nîşandanî û razberî afirandinên xwe kiribû. Di sala 1956'an de dest bi wênerêzeyan kiribû: Jin, Tazî, Otoportre, Kefen û Çarmîxkirin. Saura li dijî seqaya Frankoyî li Spanyayê hunera bi navê Koma El Paso, hunera xeyrîfermî ava kiribû. Îllustrasyona herî girîng a parçeyek ji berhema xwe ya pêşîn di sala 1962'yan de *Quevedo's Dreams* (Du Mont Schauberg, 1963) û rêzegravur û çapkirina biavî û dû re bi vîzyonên xwe yên Trois (sêbareyî) derketibû ser dika hunerê. Xebata duyemîn arezûya afirandina hêmayan bi rêya wênenivîsan (a rast, wêneyên beravêtî yên ji ber nivîsan) ku bi yekbûna metin û nîgarkirinên di nav hev de û ji hev nayên veqetandin, bi pêş xistibû. Saura di xebata xwe ya wêneyan de qîmetê bi rengandina reş û spî derxistibû pêş. Di salên 1986 û 1987'an de ji bo çapeke mezin a *Don Quixote de la Manche* gelek nîgar pêşkêş kiribûn û li dû wê jî *La Famille de Pascual Duarte* ya Camillo Jose Cela bi îllustrasyonan pêşkêş kiribû û di guhertoya Christine Noztlinger de *Serhatiyên Pînokyoyî…*

*Hibra Hindistanê* ya George Orwell a bi guaj û vernîkê hatibû nîgarkirin, ji bo nîşandana 1984'an ji aliyê Antonio Saura di sala 1983'yan de hatiye hilberandin. Romana 1984 a li dijî totalîtarîzmê weke broşurekê ye, li Londona paytexta Okyanûsyayê dibuhure ku ji aliyê serokê partiyê Big Brother ê xelkên xwe xistine binê raçaviyê ve tê birêvebirin ku ji ber şerên berê veguheriye xerabe û kavilan. Leheng Winston Smithê ku bêyî evîn û dostaniyê di nav cîhana bi dirûşmeyan ve tê birêvebirin de, ligel hevala xwe tev li tevgera veşarî ya "Birati"yê dibin. Li dû girtina xwe bi hefteyan tundî û lêdanê dibîne, li ber xwe dide û bi inyadeke mezin ji nav lepên çerxa zilimkar rizgar dibe. Saurayê ji vê helwestê peya xwe standiye, di nîgarkirinên 1984'an de bi ramana "Hevsenga navbera du zimanan diparêze: Zimanê ji ramana wêjeyê dizê û zimanê aydî ramana plastîkî. Yek ji gelemşeyên bingehîn ê îllustrasyonê, bêyî îxanetkirina li metnê parastina dengê xwe ye. Du îxanetên ku divê mirov jê bireve û du dilsozî, bêyî zorlêhatinê geşkirina wan." nîgarên xwe pêşkêş kirine.

Li galeriya ku ez lê geriyam ji 27 îllustrasyonan 19 îllustrasyonên ku Antonio Saura ji bo 1984'an a George Orwellî nîgarkirî hebûn û min jî 14 heb ji wan bi wêneyan girtin ji bo ku pêşkêşî we bikim.



Winston Smith ji ber qedexeya evîn û dostaniyê bi tevgera Biratiyê re helwesta xwe ya dijber rê dabû. Mirovên cîhana nû bi bandora teoriyên komployî ji bo nexistina maskeyan û derzîkirinê xwediyê helwestekê ne.



Ewr tarîtir, çavdêr zêdetir, ronahiyên nav malan qelstir bûbûn; nexweş pirtir, mirî zêdetir, hêviyên nav malan kêmtir dibin.



Mêjiyê Winston Smithî bi rêbazên teknolojîkî hatibû tevizandin. Li cîhana îro qedexe, sizadana diravî, girtin, jirêzêkirin, danpejirandin di meriyetê de ye.



Li ser hev nîşandana kesên xayin û nalebarkirina wan, alîgirên pergala heyî zêdetir kiribûn. Her ku mirovek ji nav me bar dike, baweriya me ya bi gotinên derewkaran zêdetir dibe.



Li Okyanûsyayê bi rêya hewayî broşur û fermanên pergalê bi ser mirovan de dibarandin. Li cîhana me bi manîpulasyonên ser wêneşana televizyonê û tora civakî rist û peywira mirovan tê diyarkirin.



Bi dûrketina ji hevdu re hestên mirovî qels û kêm bûbûn. Di nav heman malê de yek ji endamê malbatê yê/a nexweş, di odeyekê de bi tik û tenê tê hiştin û yên mayî xwe jê mihafaza dikin.




Mirov li heman cihî bûna jî, divê dûrî hevdu rawestiyana; distance Social, mesafeya civakî, dûrketina ji hevdu, roj bi roj ber bi ferdîtiyê ve.



Mirov di nav avahiyên reştarî de li binê ronahiya Big Brotherî li jiyanê temaşe dikirin; girtina sînorên navdewletî, qedexeyên derketina derve, mayîna di malê de heta fermaneke dîtir.



Çav-çav-çav-çav-çav-çavdêr-çavdêr-çavdêr-çavdêr-çavdêr-çavdêrî-çavdêrî-çavdêrî-çavdêrî. Kamera-polîs-notirvan-kal-pîr-jin-mêr-zarok.



Ramazan Olçen

## Di bin hukmê dagirkeriyê de

Êrîşên dewleta tirk ên li dijî Efrînê di 20’ê Çileya 2018’an de dest pê kir. Di 18’ê Adara heman salê de jî Efrîn tevî çeteyên xwe dagir kir. Ji dema Efrîn dagir kirine, li dijî efrîniyan her çi tiştên xerab ên tên aqilê mirov hebin wan dike. Di vê nivîsê de ez ê balê bikişînim ser wê yekê ku ev sûcên dike winda nabin, di raporan de, di çapemeniyê de tên qeydkirin û belgekirin.

Dewleta tirk jî eynî weke DAIŞ'iyan jinan dibe li bazarên koleyan difiroşe. Ev sernûçeyeke di SkyNews Erebî de bû. Çendek berê nûçeyek berfireh li ser Efrînê amade kir. Di nûçeyê de wehşet û hovîtiya dewleta tirk û çeteyên wê careke din aşkera derket holê.

Nûçe li ser îfadeyên wan jinan hatibû çêkirin ku dewleta tirk tevî çeteyên xwe êrîşî wan kiriye. Di nûçeyê de behsa revandin, îşkence û tecawiza li jinên Efrînê yên di destê dagirkeran de jî agahî hebûn.

Dewleta tirk avahiyên weke dibistan û saziyên li Efrînê veguherandiye girtîgehan. Jinên ku di van zindanan de îşkence û tecawiz li wan hatiye kirin, diyar dikin ku ji ber tecawizan zemîna van girtîgehan ji xwînê bûne weke gol.

Ji revandin û zindanîkirinê heta bi îşkence û tecawiza li jinan tê kirin hemû bi erêkirina dewleta tirk tên kirin. Her roj bi dehan jin bi vê wehşetê re rû bi rû dimînin.

Di nav bi sedan mînakên dilsoj de ez ê çîroka Selwa Ehmed Şaşo bi bîra we bînim. Dibe ku we li cihekî xwendibe jî. Ji ber ku beriya niha di Efrîn Postê de hat weşandin. Efrîn Post beriya bi demekê têkildarî wehşeta dewleta tirk ku li Efrînê kiriye û hê jî dike raporek weşand. Li gorî raporê koma çete ya bi navê Nuxbe zaroka bi navê Selwa Ehmed Şaşo ji gundê Dargirê yê Efrînê revandiye li gundê Amara yê Mabatayê veşartiye.

Piştre jî ji wir ew birine Tirkiyeyê ji wir jî îcar birine Qeterê da ku li bazara koleyan bifiroşin. Zaroka biçûk paşê li Lîbyayê derketiye. Ev pêkanîn di esasê xwe de pêkanînên DAIŞ’ê ne. Jixwe DAIŞ û dewleta tirk jî bi zîhniyetekê ne.

Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê der barê sûcên dewleta tirk de, gelek rapor amade kirine. Herî dawî rapora sala 2020’an aşkera kirin. Ne bi tenê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê; Komîsyona Lêpirsînên Serbixwe ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî jî rapor amade kirine. Di rapora xwe ya dawîn de kiryarên dewleta tirk ên li Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê weke sûcên şer bi nav kiribû.

805 sivîlên di nav wan de zarok, jin û ixtiyar hebûn hatin revandin. 54 sivîl li zindanan bi îşkenceyê hatin qetilkirin. 60 hezar darên zeytûnan hatin jêkirin. 90 hezar ton zeyt hat dizîn. 42 deverên dîrokî hatin rûxandin.

Asta kesên ne efrînî û li Efrînê hatine bicihkirin bû ji sedî 80'yê nifûsa bajêr.

54 dibistan veguherandin navendên îstixbaratî û îşkencekirina sivîlan. 20 dibistan bi temamî hatin rûxandin. Navê Qada Azadî kirin qada Tayyîp Erdogan. Ev bi tenê çend hûrgiliyên ku di raporan de hatine belgekirin, lê sûcên li dijî Efrînê û efrîniyan ji vê qat bi qat zêdetir in.

# Êrîşkarên Efrîn û Eyn Îsayê yek in

**Endamê Meclisa PYD’ê Eshan Menan der barê salvegera dagirkirina Efrînê de axivî û destnîşan kir ku biryara êrîşa Efrîn û Eyn Îsayê ji yek navendê hat plankirin û tê birêvebirin**



Navenda Nûçeyan

Efrîn bajarekî kurdistanî ye. Piştî hilweşandina dewleta Osmanî di Şerê Cîhanî yê Yekemîn de û di encama Peymana Sykes Picot (29 Nîsan 1916) de Kurdistan kirin çar parçe û Efrîn jî di nav vê perçekirinê de li aliyê Rojava ma. Cihên ku girêdayî dewleta Sûriyeyê, piştî rejîma Baasê hat ser desthilatdariyê siyaseta înkar û qirkirinê li ser gelê kurd meşand. Li hember vê yekê gelê kurd li Efrînê li dijî şovenîzma Baasê li ber xwe dida, ziman û çanda xwe diparastin.

Di sala 2011’an de dema ku gelê Sûriyeyê li dijî rejîm Baasê serî hilda kurdan jî dest bi şoreşê kir û di 20’ê Tîrmeha 2012’an Efrîn ji rêjîma Baasê hat rizgarkirin. Êdî gelê Efrînê sazî û meclisên xwe avakirin. 29 Çileya 2014’an Rêveberiya Xweser li Efrînê hat ragihandin, lê rêveberiya xwesar a Efrînê 20’ê Çileya 2018’an bi piştgirî û alikariya Rûsyayê, Tirkiyeyê êrîşî Efrînê kir û rastî berxwedana gelê Efrînê hat. Tirkiyeyê ji êrîşên xwe yên du mehan encam negirt û vê carê bi vekirina qada hewayî ya ji aliyê Rûsyayê ve bi balafirên şer êrîşî Efrînê kir.

Der barê dagirkirina Efrînê û rewşa wê ya dawî de, em bi siyasetmedar û Endamê Meclisa Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Eshed Menan re axivîn. Menan diyar kir ku bûyerên li Eyn Îsayê diqewimin, ji yên li Efrînê qewimîn ne cudatir in.

**Çekdarên Siltanên Osmaniyan**

Siyasetmedar Eshed Menan destnîşan kir ku Tirkiye her tim hewl dide Rêveberiya Xweser tune bike û wiha got: “Bi dehan komên çekdar ava kirin û navê Siltanên Osmaniyan li wan kirin. Her wiha êrîşî Efrînê kirin, lê bi berxwedaniya gelê Efrîn û hêzên YPG-YPJ’ê hemû êrîş têk çûn. Ji ber ku Rêveberiya Xweser a Efrînê roj bi roj bi pêş diket û rêveberiyeke demokratîk li ser bingeha biratiya gelan bi pêş dixist, ev tişt bi kêrî dewleta tirk nedihat. Ji ber wê di 20’ê Çileya 2018’an dewleta Tirkiyeyê bi 72 balafirên şer dest bi êrîşê kir. Tevî êrîşên artêşa tirk û çeteyên wê yên qaşo Opozîsyona Sûriyeyê ne li bejahî êrîş kirin. Tevî wê jî gelê Efrînê 58 rojan li ber xwe da û di encamê de bi plana Rûsya û bêdengiya cîhanê Efrîn ji hêla dewleta tirk ve hat dagirkirin.”

**Demografyaya Efrînê diguherînin**

Eshed Menan di axaftina xwe de bal kişand ser têkiliya Tirkiyeyê ya bi hêzên ku niha li Efrînê ne û ev tişt anî ziman: “Niha bermahiyên DAIŞ’ê û yên El Nusrayê ku girêdayî dewleta tirk in û biryara wan ji qesra Erdogan derdikeve. Ew hêzên dagirker li ser gelê Efrînê teroreke pir mezin dimeşînin û dixwazin gelê kurd ê ku niha li Efrînê ye derxin û li şûna wan çeteyan bi cih bikin. Ji ber wê jî ew rojane bi dehan kesan binçav dikin û fidyeyê ji malbatên wan dixwazin. Bi hezaran darên zeytûnê dibirin, şûnwarên Efrînê didizin, cihên pîroz ên êzidiyan hildiweşînin. Dixwazin demografiya Efrînê biguherînin.”



**Eyn Îsa û Efrîn**

Menan da zanîn ku bûyerên li Eyn Îsayê ji yên Efrînê ne cuda ne û wiha domand: “Ji ber ku biryara wan êrîşan ji yek navendê derdikevin. Armanca dewleta tirk ew e ku hemû cihên kurdan dagir bike û ‘Mîsakî Millî’yê vegerîne.”

**Ji bo rizgarkirina Efrînê**

Endamê Meclisa PYD’ê Eshen Menan herî dawî der barê şert û mercên rizgarkirina Efrînê de jî wiha axivî: “Gelê Efrînê yê ji neçarî koçî Şehbayê kir, li ber xwe dide û ji bo vegera li Efrînê têdikoşe, lê rizgarkirina Efrînê bi rewşa Sûriyeyê ya giştî ve girêdayî ye. Heya niha di navbera dewletên ku destê wan di Sûriyeyê de ye hîn jî bazar tên kirin, lê dema çareserkirina ji bo aloziyan dest pê bike, divê hemû herêmên dagirkirî werin rizgarkirin. Em jî weke gel û hêza rizgariya Efrînê, ji bo rizgarkirina Efrînê her tim têbikoşin.”



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Di şerê Qerebaxê de kî bi ser ket?

Piştî ku bi rêya çeteyên dewleta tirk ên ji Sûriyeyê beşeke mezin a Qerebaxê hat dagirkirin, lîderên her du welatan yekem car li hev civiyan.

Li pey agirbesta ku di meha mijdarê de hate îmzekirin, bi malovaniya serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn, serokwezîrê Ermenistanê Nîkol Paşînyan û serokomarê Azerbaycanê Îlham Aliyev li hev kom bûn.

Azerbaycanê di dawiya meha îlonê de bi piştgiriya dewleta tirk êrîş biribû ser Qerebaxê ku ji salên 1990'î ve di bin serweriya gelê ermen de bû. Tirkiyeyê tevî piştgiriya bi artêşê, çek û cebilxaneyan, her wiha çeteyên xwe yên cîhadîst ên ji bo pereyan şer dikin, sewqî herêmê kiribû.

Derdora paytexta Qerebaxê Stepanakert ne di nav de, beşeke girîng a Qerebaxê ji ber bêdengiya civaka navneteweyî û Rûsyayê, di encama agirbestê de hatibû dagirkirin. Piştî agirbestê jî herêmên tampon ên di bin serweriya Ermenistanê de bûn, radestî Azerbaycanê hatibûn kirin.

Lê belê tevî agirbestê hîn jî her du alî xwe nadin ber pevguhertina dîlgirtiyan. Tê zanîn ku di destê her du aliyan de gelek dîlên şer hene. Li ser vê mijarê her çiqas her du alî gotinên ji xwe bawer bêjin jî di rastiyê de çav û guhên wan li mezinên wan e.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkê wek Rûsya li herêmê giraniya xwe danî û ket dewrê. Lewma piştî ewqas êş û azarên hatin kişandin her du lîderên her du welatan bi malovaniya Rûsyayê li hev civiyan.

Yek ji armancên civîna bilind a li qesra Kremlînê ew bû ku Rûsya dixwaze 'hêza xwe ya aştiyê' ya li herêmê biparêze û nîşan bide ku pirsgirêk di kontrola wan de ye.

Ev jî bû nimûneyeke din a dîplomasiya navdewletî ku bi aşkereyî ev rastî wekî şûjinê di çavên me re kir ku

"Dewletên biçûk ên şer dikin, her dem li ber dewletên mezin serî ditewînin."

Navê hevdîtina sêalî li vê civînê hatibû kirin lê di rastiya xwe de kesê xwedî hêza biryarê serokê Rûsyayê Pûtîn bû. Jixwe ev yek bi dîzayna rûniştina li dora maseyê jî têra xwe hatibû nîşandan. Pûtîn, her du lîder wekî du xwendekarên pevçûyî li pêşiya xwe dabûn rûniştandin û ji bo li hev werin, şîret li wan dikirin.

Her çiqas Paşînyan û Alîyev di hevdîtinê de li siya hev jî nenêrîn û ji bo hev nebînin, berê xwe dan Pûtîn jî piştî vê hevdîtina sosret her sê aliyan daxuyaniyek da çapemeniyê. Ji bo nêzîkî hev nebin, li vir jî Pûtîn ket navbera serokwezîrê Ermenistanê Nîkol Paşînyan û serokkomarê Azerbaycanê Îlham Aliyev. Helbet daxuyanî jî ji aliyê serokê Rûsyayê ve hat xwendin.

Pûtîn diyar kir ku wan di hevdîtinê de li ser deklerasyoneke hevpar li hev kiriye. Serokdewletê Rûsyayê Pûtîn der barê naveroka deklarasyonê de ev agahî dan:

Ji bo bipêşxistina têkiliyên di qada aborî de û projeyên binesaziyê wê hin gav bên avêtin. Bi mebesta ev yek pêk were wê komeke xebatê bê damezrandin. Ev kom wê ji aliyê cîgirên serokên her sê welatan ve were birêvebirin.

Hêjayî gotinê ye, lîderên her du welatên Qafkas di van hevdîtinan de pesnê têkiliyên xwe yên baş ên bi Rûsyayê re dan. Ango bi gotineke din, Paşînyan û Alîyevê ku ne xwedî feraseta lihevhatinê ne, li Moskovê gotin "xwedê Rûsyayê ji ser serê me kêm neke."

Bi vê hevdîtinê derket holê ku şer jî aştî jî bi destê dewletên mezin çêdibe. Ji bo berjewendiyên xwe heya ji destê wan tê hewil didin ku welatên biçûk bi hev bidin şerkirin. Piştî şer û alozî kûr dibe jî wek qahremanan derdikevin holê û bi rola birayê mezin radibin û qala aştiyê dikin.

Ev taybetmendiyek mezin a dewletên kapîtal e. Di vê sedsalê de dewletên xwe mezin binav dikin li ser xwînê xwe didin jiyîn. Dilêşiya gelê ermen û azerî jiya jî wek sermayakê ji wan re ma, lê di vî şerî de yê bi ser ket kî bû?

Bêguman dewleta tirk jî di nav hewildanan de bû ku jî vî pastayî para xwe bigire, lê mezinbûna dewleta tirk heya Rûsya ket dewrê dewam kir. Piştî Rûsya dest avêt meseleyê dewleta tirk wek birayê biçûk li ser dûvê xwe rûnişt.

Di pêvajoya şerê Qerebaxê de helwesta hêzên navneteweyî di pêşveçûna şer de diyarker bû. Ger ev şer ne li gor dilê wan bûya wê di roja ewil de pêşî lê bigirtana, lê ji ber ku ev şer li gor berjewendiyên wan bi pêş ket ew bêndeng bûn. Mirina bi hezaran kesan ne xema wan bû.

# Baweriya civakê bi CoronaVacê nayê

**Serokê berê yê Odeya Bijîşkan a Amedê Mehmet Şerîf Demîr der barê rewşa aşiyê de axivî û da zanîn ku ji ber der barê aşiyê de tu agahî nehatin parvekirin baweriya civakê bi CoronaVacê nayê**

Bêrîvan Kayi

Ewropa, Amerîka û gelek welatên din mehek berê dest bi bikaranîna aşiyê kiribûn û li welatên wekî Amerîkayê jî ji bo teşwîqkirina aşiyê hin siyasetmedaran li hember kamerayan aşî bi kar anîbûn. Di nav mehekê de welatên girêdayî Yekitiya Ewropayê ji sê şîrketên wek BîoNTech û Pfînzerê dozên aşiyê dubare standin û aşî li van welatan tê bikaranîn.

Tirkiyeyê di meha kanûnê de 3 milyon dozên aşiya bi navê CoronaVac ji Çînê girtibûn. Tê zanîn ku tenê Tirkiye û Endonezyayê aşî ji Çînê girtibû, lê CoronaVac ne li Çînê ne jî li Tirkiyeyê heta niha nehatiye bikaranîn û ji 6 mehê ve aşiya ku Tirkiyeyê sparîş kirî di depoyan de li benda encama xebatê ne. Der barê vê mijarê de serokê Odeya Bijîşkan a Şaxa Amedê yê berê Mehmet Şerîf Demîr axivî. Demîr diyar kir ku ji bo haya saziyên tenduristiyê û ya civakê ji fazê û xebatên aşiyê tune ye bawerî bi CoronaVacê nayê.

Demîr di axaftina xwe de têkildarî rewşa giştî ya dozên aşiyê diyar kir ku heta niha ji aliyê saziya tenduristiya cîhanê ve 4 aşî bi navê BîoNTech, Pfînzer, AstraZeneca û Moderna hatine qebûlkirin û wiha got: “Îro her çar aşî êdî hatiye erêkirin ku tu zirara wan tune ye lê helbet tesîra wan ji hevudu cuda ne. Li welatên Ewropayê 2-3 cureyên aşiyê tên bikaranîn lê li Tirkiyeyê tenê yek cure ye û ew jî ya ku ji Çînê hatiye girtin. Yanî ji bo çi Tirkiyeyê tenê biryara aşiya Çînê daye em sedemên vê yekê nizanin û heta niha ji aliyê wezîrê tenduristiyê ve yan ji aliyên hin kesên din ve nehatiye gotin.”



**‘Civak aşiyê ewle nabîne’**

Mehmet Şerîf Demîr der barê rewşa bikaranîna aşiyê ya dawî de da zanîn ku heta niha ne li Çînê ne jî li Tirkiyeyê têkildarî aşiya koronayê tu agahiyek nehatiye parvekirin û ev tişt anî ziman: “Ji xebatên fazê heta yên din çawa hatine kirin ne bi saziyên sivîl ên li Tirkiyeyê ne jî bi civak re nehatine parvekirin. Ji ber vê yekê jî baweriya civakê bi vê aşiyê nayê û ewle nabîne. Ger aşî li Çînê bihata ceribandin û xebatên fazê (bi awayekî ku aşî li ser çend kesan, kesên temenê di ser 60’î re bandoreke çawa li wan kiriye) li Tirkiyeyê bihata kirin dê helbet civak hê cudatir nêzîk bûbûya. Yanî îro hewce ye bersivên van pirsan bi civakê re parve bikin. Mixabin ji ber ku ev yek nayê kirin, civak bi fikar e, aşiyê ewle nabîne. Baweriya civakê pê nayê. Ji ber vê yekê jî di serê gelek kesan de pirsa ‘gelo em aşî bibin an na?’ heye.”



**120 milyon aşî divê**

Demîr di berdewamê de diyar kir ku Tirkiye 3 milyon dozên aşiyê ji Çînê aniye lê ev hejmara aşiyê dê têra Tirkiyeyê neke û wiha pê de çû: “Her wiha mehek berê Tirkiye gotibû ew ê 50 milyon dozên din ên aşiyê jî bînin û di nav van de tenê ne CoronaVac dê BîoNTechê jî hebe, lê niha tenê 3 milyon CoronaVac heye. Niha li gorî şert û mercên Tirkiyeyê nêzî 120 milyon dozên aşiyê hewce ye. Çima 120 milyon, ji bo ku welatiyên li Tirkiyeyê laşê wan dikaribe li ber xwe bide ji sedî 60-70 kesan yek divê aşî bibe. Yanî 3 milyon aşî bi serê xwe tenê têra tenduristvanan nakin!”

**Plansaziya ji bo aşiyê**

Her wiha serokê berê yê Odeya Bijîşkan a Şaxa Amedê M. Şerîf Demîr di dawiya axaftina xwe de ji bo rewşa dawî ev tişt anî ziman: “Îro li Tirkiyeyê plansaziya aşiyê çawa ye, ji tenduristvanan heta saziyên tenduristiyê û civakê tu kes nizane. Ev yek bi tu kesî re nehat parvekirin. Yanî ji bo civak tev jê sûd werbigire hewce ye plansaziyeke baş bê amadekirin û bi awayekî zelal bi civakê re bê parvekirin.”

## ‘Rejîm çareseriyê asteng dike’

Gerînendetiya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê girêdayî sûcên hikûmeta Şamê yên li dijî Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) de daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê hat ragihandin ku rejîma Sûriyeyê siyaseta xwe li ser alozî û mijarên ku bingeha wan tune ye, dike û wiha got: “Ev yek di nameya Wezareta Karên Derve û Koçberan a Hikûmeta Şamê de ya ji bo sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) û serokê meclisa ewlehiyê girêdayî êrîşa hewayî ya li dijî bajarê Dêrazorê û herêma El-Bû Kemalê, derket holê.”

Gerînendeyê bal kişand ser mijara teqîna ku li Qamîşloyê pêk hat û ev tişt anî ziman: “Dema mirov bala xwe bide aloziya ku endamên rejîmê li Qamişloyê hefteya borî derxistiye, tawanên ku Wezareta Karên Derve ya Sûriyeyê li dijî Rêveberiya Xweser û HSD’ê kirine ev tev nîşan didin ku ew berpirsiyarên van aloziyan e.”

Di daxuyaniyê de gerînendeyê da zanîn ku divê rejîma Sûriyeyê ji siyaseta xwe ya ku tenê Sûriyeyê wêran dike berde û wiha bang li rejîmê kir: “Helwesta xwe ya li hemberî bûyerên li Eyn Îsayê û hevkariya xwe ya bi dagirkeriya tirk re ji bo radestkirina herêmên din ên Sûriyeyê hewce ye zelal bike. Ev siyaset rêya çareserî û diyalogê digire û aloziyê kûrtir dike.”

Her wiha gerînendeyê diyar kir ku her çiqas nêzîkatiyên êrîşker hebin jî dê li gorî rêgez û armancên xwe tevbigerin û daxuyanî wiha bi dawî kir: “Em tevahiya teşeyên girêdana bi aliyên derve re red dikin. Em bi rola xwe ya niştimanî ya Sûriyeyê û armancên ku hewl didin ji bo Sûriyeyê pêk bînin, serbilind in.”

*QAMIŞLO*



Destar

Ehmed Pelda

# Destpêka nivîsê û aboriya serdestan

Heke şaristanî bi pîvanên qalkirina modernîzmê bê pêşkêşkirin, belê rast e, em civateke şareza nîn in. Ji ber ku dewleta me nîn e, alavên me yên modern û bi destê me çêkirî tune ne, navgînên me yên ku em wek şaheser bidin berçavan nehatine damezirandin. Vegotin û nivîsên têrgihîştî û giraniya xwe bibin navnîşana pesindayîna me hê nehatine ser maseyên pêşangehan. Her weha sermayedarên me yên xwedî pere, banke, kargeh, karxane û barxane jî pêk nehatine.

Heke hin tişt di nav civata me de hatibin damezirandin jî ne hevtayê welat û civatên modern in. Hejmarek zêde li ser zemîna modernîzma dewletên serdest hatine avakirin. Sazûmanî û pergalsaziya wan rengê xwe daye berhemên pêkhatî yên bi destê me hatine çêkirin, lê hiş ne hişê me ye ku em bi hunera xwe, bi hişmendiya xwe, bi teşeyê bedewiya xwe tiştan binexşînin.

Belê, lê tiştekî din heye. Bi gotina nasekî min ê afrîkî ku ew jî wek min ji welatê xwe sirgûn bûye, digot: “Rast e, topên me, tangên me, çek û sîlehên me nîn in, zêr û zîvên me, xanî û destgehên me yên bêhempa jî nîn in. Cil û bergên me jî nîn in, lê em bi tena serê xwe meriv in. Ev bes e. Merivekî rût û tazî çawa bi milyonan salan jiyaye? Gelo kes li ser vê difikire? Ma rewa ye ji civateke wiha re bêjin paşdemayî an jî hov?”

Niha wekî destpêka şaristaniyê her kes Sumeriyan destnîşan dike. An jî şaristaniyê bi dîtina nivîsê pênase dikin. Gelo ev rast e? Wê çaxê divê em bipirsin, çima nivîs hewce bû ku pêk hat?

Wekî eleqedarekî aboriyê angaşta min ew e ku nivîs hewce bû ji ber ku dizî, zordestî pêk hat û zeman hat hesibandin.

Wekî Proudhon tîne ziman “eraziyê arizî dizî ye.” Rast e, lê ne bes e. Ji ber ku wî zemanê diziyê bi sermayedariya kapîtalîzmê ve daye destpêkirin. Bi dîtina min, bi destpêka sazûmaniya hiyerarşiya di navbera civatên komî de dest pê kiriye. Werin em kortên giliyên vê mijarê vekolin:

Komên herî pêşketî ên bênavgîn di nav xwezayê de karibin jiyana xwe darbas bikin ku merivê modern nikare seredariya vê bike. Ji ber ku hevkariya şixul û hevpariya berhemên xwarinê dest daye ku bikaribin xwe biparêzin, xwe bi cih bikin û xwe têr bikin. Bala xwe bidinê bi sed hezaran salan ev civat li ser rûyê erdê mane û jiyana xwe derbas kirine, lê şaristaniya modern xwedî temenê çend hezar salan e û niha bi metirsiya tunebûnê re rû bi rû maye. Civatên temen dirêj qanûnên xwezayê baş zeft kiribûn. Cihûwarê lê dijîn, bi hêşinahiyan, bi raweran, bi çavkaniyên avî û erdên zuha, bi çêreyên xwarinê û yên jehrî nas dikirin. Nasîn û dîtina xwe jî yekser bi hev re parve dikirin. Lewma zanîn milkê yekî nîn bû yekser dibû para her kesî. Kal û pîr, zarok, keç û xort, jin û mêr karê xwe, zanîna xwe, navgîna xwe, hebûnên xwe bi hezkirinê, bi yekrêziyê parve dikirin. Ew rihê malbatî yê ku niha em hev diparêzin koka xwe ji wir girtiye. Her weha li gor demsalan şikeft, gir, best, çiya, zozan, germiyan, daristan, barxane, xanî jî di bijartin, aşkera dikirin û bi kar dianîn. Bi saya naskirinê ev zanîn hewce nedîtin berheman zêde kom bikin û bidin serhev û veşêrin. Di encamê de zemanê wan jî zide dima. Tecrûbeyên xwe, xewn û xeyalên xwe, agahiyên derbarê xweza, hêşînahî, nebat û çêreyên dibin derman an jî jehrî ne, cureyên ajal, rawer û sewalan parve dikirin û hev haydar dikirin. Bênavber danûstandina agahî, parvekirina kar û bar yekser digihîşte encamê.

Her wiha ziman jî bi pêş diket, zêdebûna hejmara peyvan, runiştandina rêgezên ziman baştir dibû. Wekî mînak bi reşandina tovekê, bi zîldana wê, hêşînbûn û seridiya wê û her merheleyeke wê bi navekê destnîşan dikirin. Ji bo keviran, ji bo demsalan, ji bo raweran, ji bo merivan ziman dibû sembola tiştan û îro jî em mîrateya wan bi kar tînin.

Dîsa cin, cebelî, hût, qerepere, ferîşteh, tirs, xof, coş, geş, rih, can, zên, bîr, derûnî û hwd. hebûnên xeyalî yan jî taybetiyên can û bedenê koka xwe ji merivên berê digire. Sinc/ehlaq, hurmet, ked, hezkirin, çêwî, başî, xerabî, alîkarî, diyarî û her wiha ev rêgezan bi kêşa bi sedhezaran salan dirûv girtine.

Bi destê şaristaniyê serdestiyê ev bûne ayetên bawermendiyên dînî, bûne navgînên rêxistina danûstandinên mirovan.

Feylesofiya modern bêyî zanîn, ziman û têgînên van civakan nakiran xwe saz bikin. Belê li gor şert û mercan van sembolan dikemilînin, xurt dibin lê ji kokê naqetin.

Em vegerin li ser meseleya dizî, zordestî û zeman. Zana û mamosteyê herî mezin, wek hat destnîşan kirin, xweza bi xwe ye. Heke rêgez û mercê xwezayê neguherin mirovahî zûbizû nikare tiştekî nû bibîne.

Sir û seqem, ba û bahoz, berf û baran û serdema qeşayê bû gaveke nû ji bo dîroka mirovahiyê. Wekî berê peydakirina xwarinê ne hêsan bû. Şikeft, germiyan, çiya , zozan û xwarinên çêreyî kêm bûn. Pêwistiya nêçîrvaniya sewalan zêde bû. Ji bo vê jî xwerêxistinkirina ciwanan bû merc. Bidestxistina laşê heywanan, jêkirin, parçekirina çerm, hirî û goşt û hestiyê wê, riya parvekirina bi pergal, bi rê û dirb nîşan da û gelek caran berhemê nêçîrê têr nedikir û lewma kesên xurt û zorbe xwarin destdeser dikirin. Zordest bûn serdest, zarok bûn berdest, jin bûn bindest, kal û pîr bûn dizek. Çima ku bêçare bûn, lê ev dizî diziya veşarî nîn bû. Tecrûbeyên xwe parve dikirin, çîrok û metelok digotin, rê û dirbên fikirînê diafirandin û hîn dikirin. Ji bo nakokî, şer û pevçûnan navçeyîtî dikirin û bi vî awayî rêberiya manewî dikirin. Ango xurtbûna xwe ya zanîn wek navgînek bi kar dianîn û xwarin, cil û berg bi dest dixistin. Piştre ew bûn kêşe, mele, şêx, rêberê dînî; dêr, mizgeft, medrese saz kirin, sedeqe, zekat li ser gel ferz kirin. Her wiha zeman jî bû mijara hesaban zarokî, ciwanî û kalbûn girêdayî hiyerarşiyê hat hesibandin. Demsal û berhemên wan ên hêşinaniyê yan jî sewalan, her wiha çandiniyê hat hesibandin ku mijara hesab jî zeman bû. Berhemên zêde hatin komkirin û li gor mehan, hefteyan û rojan hat hesibandin. Ev hemû hesab li ser keviran, daran, postan hatin neqişandin û nivîsê jî dest pê kir. Jimaryarî, venêrîn, budçe û xezîne ava bûn. Bingeha dewlet û pergala modern û sermayedarî çend hezar sal beriya îro dest pê kir.

# Yaqûb Axa: Serhildana Dihê[2]



Mem Avba

**Yaqûb Axa û gelek eşîran li dijî komara tirk a nû li ser înkara kurdan ava bûbû, bangî serhildanê kiribû. Hinek eşîr, ji ber nakokiyên takekesî tev lê nebûbin jî piranî eşîrên herêmê tev lê bûbûn. Sê hezar siwarên şer ne hêzeke hindik bû**

Demsal havîn, nîvê meha tebaxa 1926'an bû. Tava tebaxê gil û giyayê Garisan kizirandibû. Axa ji tavê sincirî, ji ber simê bi hezaran hespên cengê, weke xweliya agir hûr bibû û li pey xwe weke mijê toz radikir.

Artêşa ji sê hezar siwaran pêk dihat, bi pêşengiya Yaqûb Axa, Şêx Evdirehmanê Garisî û Gurgîn Axa de amade bûn ku bavêjin ser Dihê. Her sê hezar cengawer bi rext û çek, cil û bergên kurdî gurçûpêçkirî bi vê dîmena xwe hêviya serkeftin û serfiraziyê didan. Herêma Botanê weke di dîroka xwe de gelek caran kirî, dîsa amade bû seranser ji şerekî giran, cenga rûmetê re malovanî bike. Yaqûb Axa û gelek eşran li dijî komara tirk a nû li ser înkara kurdan ava bûbû, bangî serhildanê kiribû. Hinek eşîr, ji ber nakokiyên takekesî tev l nebûbin jî piranî eşîrên herêmê tev lê bûbûn. Sê hezar siwarên şer ne hêzeke hindik bû, ji bo şikandina tûraniyên têjikê dêlegurê bes bû!

Li gorî plansaziya çêkirî, dê hêzên bi pêşengiya Pîr Êzdîn Axa de bavêtana ser Xesxêr/Berwariyê ku li rûyê piştê yê Herekolê dima. Hêzên girêdayî Yaqûb Axa, Gurgîn Axa û Şêx Evdirehman jî dê bavêtana ser Dihê ku di navbera çiyayên Herekol û Çiravê de dima. Bi vî awayî dê beşeke mezin a Botanê weke berê biketa bin serweriya hêzên kurdî.

**Yaqûb Axa bang li serhildêran dike**

Yaqûb Axa ku xwedî bejneke bilind, gewdeyeke girs bû hespê xwe çend gavan deranî pêş, serê hespê xwe zivirand, li cengawerên ji şer re amade nihêrî û bi awayekî serbilind banga beriya cengê li şervanên xwe kir:

"Mêrxas û egîdên min! Roj, roja şerefê ye. Em ê bi destûra xwedayê dilovan Dihê ji neyar rizgar bikin. Bila gunehê me li mufrezeyên zalim neyê. Ev zalim bi ziman û çandeke ku em jê fêm nakin, navên nû li me dikin, navê ax û warê bav û kalê me yê bi hezaran salan diguherin, zimanê me qedexe dikin, cil û bergên me qedexe dikin. Bila gunehê me li parazvanên vê hikûmeta zalim neyê. Ne xwedê, ne jî evd vê qebûl dikin. Di vê riya bi şeref û rûmetê de mirin, ji jiyana di nav şerm û fediyê de çêtir e. Bi îzna xwedayê mîhrîban serkeftin a me gelê bindest e!"

Piştî van axaftinên Yaqûb Axa şervanên ku dilê wan bi hêvî û kelecana serkeftinê germ bûyî bi dirûşmên serfiraziyê bi dengekî qêriyan û li Yaqûb Axa vegerandin. Dengê dirûşmên siwariyan ji zinar û newalên Herekolê olan dida. Her sê hazar siwaran, ji çiyan berê hespê xwe dan Dihê û Berwariyê, baregehên zilimkaran!

**Dihê kir bin serweriya xwe**

Mufrezaya hikûmeta Misto Kemal a Dihê, li hemberî sê hezar siwar û şervanên çiyayî ti şensê wan tune bû. Destpêkê dest li ber xwe rakiribin jî bergiriya wan zêde nedomiya û li hemberî cengawerên kurd şikestin û di demeke kurt de bajarê Dihê kete destê hêzên Yaqûb Axa.

Hêzên bi pêşengiya Pîr Êzdîn de ku xwedî heman kelecan û giyanê bûn, bi heman şêwazê êrîş dibin ser Xesxêr û bajêr dixin bin serwriya xwe. Serhildêran di demekê de ku rejîma Misto Kemal xwedî pozbilindiya serkeftinê bû her du bajar xistibûn bin serweriya xwe û derbeke giran lê dabûn. Hêzên serhildanê ji aliyê gelê her du navendan ve bi keyfxweşî û bextewariyeke mezin hatibûn pêşwazîkirin.

Belê her tiştek dem û hesabekî xwe heye! Piraniya mufrezeya komara tirk destê xwe rakiribûn û teslîm bûbûn, lê hêrs û kira Yaqûb Axa ew bû ku fermandarê mufrezeya ku kefiya wî ji serê wî deranî û avêtî erdê û heqaret lê kiribû, ji bîr nekirbû û dê jibîr nekira jî. Yaqûb Axa yek bi yek li nav leşkerên radestbûyî seh dikir ku heta hate rastê fermandarê teslîmkar.

Fermandarê mufrezeyê yê qure, pozbilind ku haşa xwe weke xwedayan didît, ji tirsa bûbû wekî hejikekî, çawa çav li Yaqûb axa ket, tiştên ku çend meh berê anî serê wî hat hişê wî. Fermandarê mufrezeyê bi destê xwe yê dayî ser hev û stûyê xwehrkirî hat li pêşiya Yaqûb Axa çok da erdê û dest bi lava û zarînan kir. Ji tirsa reng û rûyê wî nemabû. Yaqûb Axa ji serî heta binî lê nihêrî û gotê:

"Ez ê tenê tiştekî ji te bipirsim; çi zerera kefiya min gihabû te? Te, ji cil û bergê mirovan çi dixwest?"

Li ber dengê Yaqûb Axa yê bilind, çokê fermandar sist bûbûn, xwe li ser piyan nedigirt. Bi dengê lerzok û bi zorê encax peyvên nîvco ji devê wî derketin: "Emir wisa bû. Paşa…"

Gotin di gewriya wî de şela bûn, dernediket. Xwest bikuxe ku qirika xwe paqij bike, lê nekarî bikuxe jî û dîsa bi zorê karî bêje "pppaşa paşa, paşa qanûn derxistiye. Min tenê ew pêk anî!"



Li ser van gotinên efser Yaqûb Axa mîna agir ji çavên wî bibarin hêrs bû û got:

"Yên weke we ku ruhê xwe difiroşin mewkî û meqaman, erk û pere nebin, emrê paşayê li qesra xwe 24 saetan serxweş çi qîmeta xwe heye? Ya rast, tu sûc û gunehê paşa nîne; sûcê mezin ê koleyên wekî we ku xwe firotî malê dinê û hêzê ye; gunehê we yê ku ji bo berjewendiyên xwe, xwe dixin şûna xwedê..!"

Sê meh bûn ku ev her du navend di bin serweriya hêzên Yaqûb Axa û Pîr Êzdîn Axa de bûn, lê belê agahî hatibû ku Misto Kemal hêzên xwe yên herêmê, li Sêrt û Wanê kom kirine û haziriya êrîşeke mezin dike. Bi deh-hezaran şervanên fedayî yên kurd ji şer û mirinê re amade bûn, lê belê di encamê de hêza li pêşberî wan artêşa dewletê bû, xwedî bi sedhezaran leşker, tang û top, cebilxane hwd. bû, dîsa nav û tirsa xwe li tevahiya welêt bi zilm û zorê serwer kiribû. Lewre vê yekê pêşengiya serhildanê dixist fikaran, lêbelê dema biryara vê dozê dayî, ev rastî jî dabûn ber çav û dê xwe jê nedana alî…

**Jin, zarok, kal û pîr qir dikin**

Payîz ber bi zivistana reş ve dikudand. Dîsa şer li ber derî bû. Bi rojan bû şer didomiya. Şerekî newekhev, şerekî nemerdane, xedar û bêbext. Şerê dagirker, qirkeran û berxwedêrên hebûn û rûmetê bû. Li aliyekî artêşa dewleteke barbar, xedar, bêrehm û dagirker; bi çek û cebilxaneya giran, li aliyê dîtir şervanên dilsozê ax, welat, ziman, çand û gelê xwe, dilê xwe kirbûn mertal. Ji kolanên Dihê yên teng xwîn diherikî. Qad û kolan tijî termê miriyan bibûn, artêşa hikûmetê ne tenê li dijî şervanan li dijî gel jî dest bi hovîtiyê kiribû. Jin, zarok, kal û pîr kî diket berê wan qir dikirin!

Her diçû hêza Yaqûb Axa teng dibû. Li hemberî artêşa hikûmetê hem ji aliyê hejmar, hem jî aliyê çek û cebilxane ve bêmecal diman. Di nav bajêr de asê, dorpêçkirî mabûn. Serhildan bi van her du bajaran ve sînordar mabû, lewre hikûmetê hemû hêzên xwe şandibûn ser wan. Li dijî çekên giran, şerê kozikan encam nedigirt.

Dem li dijî hêzên Yaqûb Axa dikudand. Şervanên cebilxaneya wan qediyayî vedikişiyan çiyayan, yên ev mecal nedîtibana jî yan heta mirinê şer dikir an jî diket destê dijimin!

Xeberên nebixêr zû belav dibin. Destpêkê agahî tê ku hêzên Pîr Êzdîn Axa yên avêtî ser Berwariyê hatine şikandin û serhildan hatiye çewisandin, serokê serhildanê Pîr Êzdîn Axa bi saxî ketiye destê neyar û bajar dîsa ketiye bin kontrola hikumetê…

Hêj berxwedana hêzên Dihê didomiya û çend çeper di destê berxwedêran de mabûn. Berxwedêran bi hemû hêza xwe ve şer dikir. Gelek xwîn hatibû rijandin, ji her du aliyan jî kuştî zêde bûn, lê êdî ber bi dawiyê ve diçû. Lewre artêşa hikûmetê şandeyekê dişîne û dixwaze ku ji bo zêdetir xwînê nerijîne şertê radestbûna ji bo Yaqûb Axa û Gurgîn Axa radigihîne.



**Li Dihê tên dorpêçkirin**

Yaqûb Axa yê li herêmê bi kesayeta xwe ya têgihiştî, kemilî, zanyar û rêzdar dihat nasîn, li çavên destebirayê xwe Evdirehmanê Garisî nihêrî, lê zêde nekarî lê binêre. Her duyan jî fêm kiribû ku xafil hatibûn zeftkirin û ev ji bo zarokên qewmê çiyê nedihat qebûlkirin. Li navenda Dihê dorpêçkirî û asê mabûn. Heke dema Dihê girtî, nesekinîbûna û êrîşên xwe berbelavî deverên din ên dagirkirî kiribana, îro li vir asê nediman. Serkeftineke biçûk ji xwe re bes dîtibûn. Têkilî û tifaqa xwe bi eşîr û herêmên dîtir ên Kurdistanê re bi pêş nexistibûn. Lewre encama dilsoj a serhildanên berê, dihat serê Yaqûb Axa, serhildana Dihê jî…

Yaqûb Axa, li destebirayê xwe Şêx Evdirehmanê Garisî zîvirî û bi kotekî karî biaxive: "Şêxê min, tu ji vir derkeve biçe. Tu dibînî, êdî em ber bi dawiyê ve diçin. Em nikarin bi ser bikevin, lê me li hemberî dagirkeriyê serî jî netewand. Pêşerojê divê tu teqez heyf û tola me rakî…"

Şêx Evdirehmanê Garisî bi dilekî nerazî li Yaqûb Axa vegerand; "Hûn radest bibin jî dê we bikujin. Werin em bi hev re vekişin çiyê. Dema pêş em ê dîsa bi hêzeke mezintir xwe birêxistin bikin, ji xeletiyên xwe ders derxin û dîsa şer bînin ber deriyê hikûmetê."

**Baweriya xwe bi wan neynin**

Şêx Evdirehman jî dizanî ku heke radest nebin dê xwînxwarên Misto Kemal zêdetir xwînê birijînin. Lewre piştî ku Yaqûb Axa bêbersiv ma, xwe amade kir ku li gel her du kurên Yaqûb Axa Yûsif, Xelîl û hinek şervanên xwe ji Dihê derkevin û berê xwe bidin çiyayê Botanê. Dema ketin rê Yaqûb Axa; "Wesiyet û şîreta min e. Bila nifşên me yên nû tu carî baweriya xwe bi sozên dewletê neynin. Bextê Romê tune. Ez dizanim dê me bikujin, lê ev gel bêguneh e. Ji bo zêdetir zirar negihê can û malê wan em ê radest bibin."



# Kerdeneyê teberê merdimayî pêk yenî

Helîn Uzel

Rojhilato Mîyanênî de hewl yeno dayîş ke Osmanîya newîye bêro awankerdene. Naye rê zî dewlete verkêşî kena. Pirsgirêka tewir pîle verva no hewldayîşî zî şaran ê azadîwaz ê. Seba ke ena mexsedê xo bîyara ca, teknîkanê tewir averkewteyan ê serdeme bikar ana. La belê îradeyê ewladanê şaro kurd hesab nêkerdbî û coka heme planê ê kewt têmîyan. Ê ke verkêşîya xoverdêrîya tarîxî kerd, bêguman ewladê şarê kurd ê. Ay semed ra verva ercê tewir pîle ê şarê kurdî de kerdeneyanê teberê merdimayî pêk anena. Tu ercêke wîjdanî nas nêkena û hewl dana vîrê civatî orte ra wedara. Na hovîtî zî nawneno ke, senîn verê vîrê civatî kewt mîyanê tersêk pîl. Selahîyetdaran bi rojan cenazeyê şehîdan morgan de verdenê û bi nêdayîşê cenazeyan yan zî bi ferzkerdişê şewe de definkerdişê cenazeyan, keyeyanê ewladanê xoverdeyoxan dejnenê.

Minak, Mercan Erkole 16ê Teşrîna Peyêne ya 2017î de herêma Şenyayla de şehîd biye. Pîye aye Hessîn Erkolî 17ê Adara 2019î de pêhesîyeno ke keynaya ci cuwîya xo vînî kerda û naye sero zî seba girotişî cenazeya xo muracate ro serdozgerîye dano. Hessîn Erkolî nêzdî 10 reye serre piroda la hama zî cenaze nêdîyaya ê.

Serhat Kaya Tebaxa 2019î de herêma Talê ya Colemêrgî de şehîd bibi û her çend ke keyeyê ci seba testê DNA gonî dayo zî cenaze nêdîyena. Zey hincet zî 'seba ke herêm qedexe ya' cenaze herême ra nêameya girotene nîşan danê. Halbûkî selahîyetdaran biwazê eşkenê şorê herêma ke înan bi xo qedexe kerdî û cenaze bîyarê. Bi goreye dewijanê herême, înan esteyanê însanêke dîyî û ca de binerd kerdî. Birayê Serhat Kayayî, Kenanî vano ke 'yew dest zî bibo, ma cenazeya xo wazenê'.

Seyîtxan Acayî 30ê Temmuze de şehîd bibi û nika goristanê bêkesan ê Şirnexî de ameyo definkerdiş. Keyeyî Acayî wazeno cenazeya xo goristanê bêkesan ra veco. Seba naye zî gonî seba testê DNA dayî, la hema zî cenaze teslîmê keyeyî nêbîya.

Cenaze, yan zî esteyê Serhat Aykulî 4 aşmî badê şehîdbîyîşê ci, mîyanê torbeyêk sîya de teslîmê keyeyê ci bi. Ne Şaredarîya Seyhan ya Adana wesayît dabî û ne zî camî tabut dabî keyeyê Aykulî.

Cuma Îmen 24ê Temmuza 2017î de şehîd bibî. Verîya ke cuwîya xo vînî kerd, esîr kewt destê artêşa tirke û îşkence dî. Cuma seba ke verê kamerayan de vat 'sibayî ra danê min ro' ame şehîdkerdiş. Cenazeya ci heta nika nêdîyaya keyeyî ci. Daya Cuma, Salîha vana ke, aye esteyanê lajê xo wazena.

Egîd Îpek... 23ê Gulana 2017î de Dêrsim de şehîd bî. Helbet heme estanikê keyeyî şehîdan merdim dejnenê. La hovîtî tewir peynî verva cenaze û keyeyî Egîdî de xo nawit. Domantîya Egîdî, bi sebebê nameye 'Egîdî' û bi binçimkerdişê ci dest pê kerd. Dima ra bi şirawitişê esteyanê Egîdî bi raya kargoyî ya seba daya êy Halîse Aksoye dewam kerd. Aye bes nêkerd, daya Halîse ameye derbkerdiş û binçimkerdiş.

Wexto ke însanêk, bi raştî wayîrê însanetî bo, na perse ano hişê xo:

Wîjdan! Ti kora yî?

Helbet nêy tenê çend mînak ê. Bi seyan keyeyî estê ke paweyê cenazeyanê domananê xo yê.

Cenazeyê ke keyeyan rê yenê teslîmkerdene zî saetanê şewe de definkerdiş yeno ferzkerdiş.

Yeno zanayîş ke faşîzm her tim raştî ra terseno. Ewladanê şarê kurdî ke oxirê ci de eşkenê xo feda bikerê, cuwîya ra hez kenê û raştî danê şarê xo. Reyna êrîşê mezelan zî yenê kerdene û mezelî yenê texrîbkerdene. La verva nêy heme êrîşan de reyna zî xoverderîyêk esto. Dadî û keyeyî verva na hovîtîye xover danê. Serreçewt nêkenê û heme hovîtîyan vero vecîyenê. Zey heme wextan, dadîyan bi waştêka azadî, cevab danê zilm û hovîtîyan. Nobedê mezelê domananê xo gênê û nêverdenê dişmen nêzdî bibo. Çimkê baş zanenê ke şehîd sebebê bingeyîn ê tekoşînê verva faşîzm û îşgalî yo. Wayirvecîyayîşê ro şehîdan derbeya tewir pîle verva faşîzmî yo.




# Ma na serra neweye ra çi wazenê?

Murad Tunekragij

Ma yewna serre apey werdayê. Derheqê serra ke apey mend de ma zaf qalan kerdî. Ge ge ma lomeyan kerd û ge ge zî ma zewt dayê pîro. La ma şîyayîşê ci ra zaf kêyfweş zî biyê. Şima wajê çina ra? Serra 2020 hetê merdimîye û hetê komelî ra zaf giran derbaz bî. Ez vana qey no hewa yewna serre ma nêdîya. Yew het ra pandemî yew het ra pergalê serdestî, şaran dewist yew halê tewş. Dest û linganê ma best pê. Na nêeşkayê hilm bîgîrê. Na semed ra serra ke ma vîyarna raştî zî yew serra xidar bî. Ma na semed ra şîyayîşê na serre ra zaf baxtîyar biyê.

No halê ma ge ge vateyon ma de, ge ge qalon ma de û ge ge zî terekanê (sohbet) ma de xo bewlo keno. Ez vînena ke şaranê ma mîyan de zî ge ge; 'na serre şîya ma ti ra xelisîyayê ûsb' qalî yenê vatiş. Yew het ra ez heq dana şarî zî. La serranewîye de do çi bedelîyo? No pers qet vîrê mi ra nêşino. Ez vana qey na serranewîye ma dekewt de na het ra do çîyêk nêbedilîyo. Serra verîn semedê şarî yew serra desttengî bî. Şarê ma û şarê cîhanî zaf kewtê tengasî. Na semede ra ganî ma munaqeşeyê serra vîyerte hewl bîkerê. Heta ke ma raşt nêewnê serra vîyarte, ma nêeşkenê serra newîye de nefes bidê û berpirsîyartîya xo baş bîyarê ca. Çîyo ke serra şîyayê ra hişê ma de mendo, persê teşxeleyê. Na semed ra serra 2021î ra pawitişê ma zî vîşê. Çimkî ma zaf manaya vîşî nayo na serra neweye ser.

Merdim çend zaf çîyêk pawit, aye çî hende merdim het de benê çîyê ercîyayeyî. Raşta zî na serre hetê şarê ma ra û şaranê bînan ra yew serra ercîyaye ya. Waştişanê ma de zî wina ya. Ma yew het ra wazenê aşitî û azadî bibo, yew het ra zî ma wazenê hetê debarî de wa binêk asanîyê virazîyo û yew het ra zî wazenê wa na kûla bêderman (pandemî) bîqedîyo. Nê waştişê ma zaf çîyê zêde nîyê. Hema zaf zorê zî. Caameyîşê nê waştişan pabesteyê ma yî. Heta ke ma berpirsîyarîya xo nêarê ca, ez vana qey waştişê ma zî do nêrî ca. Yan zî do nê waştişê ma tûk û tena waştiş bibî. Nê waştişî raştîya cuya ma yî. Zaf çîyê xeyal zî nîyî. Kesêk nêeşkenê vajo nê çîyê tewş î. Hema tîya de çîyêko muhîm esto. Raştî ma û waştişê ma têsere nêkenî. Raştîya komel û waştişê ma yewbînan ra zaf dûrî yî. Çina ra? Waştişê ma binêk raştîya dinya û şarê ma ra dûrî yî. Heta ke ma na mesela de yew xêzêka raşt nêtepişê, ma hem raştîya şarî ra dûrî kewenê û hem zî nêeşkenê xo bişinasnê. Eke wina biba, ma nêeşkenê cuya xo zî dewam bikerê.

Raştîye sewbîna çîyêk a, xeyal sewbîna çîyêk a. Yew mantiqê raştîye esta. Xoser a. Xeylê reyan teberê vîrê ma de wext esto. Eke ma nê xususan nêzanê ma raştîya komelî ra, raştîya hîşî ra û komelnasî ra dûrî kewenî. Ge ge zî ma tesîrê na raştîye zanê, hema ma dest ra çîyêk nîno. Merdim nêeşkeno na raştîye bibedilna. O wext merdim xo bi xo ra perseno. Çinara na çîye wina bî? Sewbîna tewir nêbînê? Ti tena nêeşkenê heqê nê persan ra bêra/î. O wext çîyêk yeno to vîr, o zî komel o.

Ti fehm kenê ke tena rêxistinbîyayîş eşkeno na mesela çareser bikera. Daraxê yewine de na problem bi rêxistinkerdişê komelî zelal beno. Na çîyêk muhîm a. Raştîye aye wext cayê waştişanê ma gêna. Ma zî goreyê na raştîye xo rayirfînenê. Ma êdî zanenê ke heta komel nêxelisîyo ma zî nêxelisîyenê. Na semed ra ma gamanê xo gorebî na mercî erzenê. Xora ma gorebî na mercî gamanê xo nêerzê, yew cuyêka teng ma pawena. Cuye de ma betilîyenê, hewesê ma şikiyenê, ma raştîya komelî ra û raştîya xora dûrî kewenê. Na rewşe zî nîna qabulkerdiş. Aye wext ma sekerê? Heme çî ra ver ganî ma bizanê ke raştîyê komelî yew raştîye awan kerdiş o. Serdestî na raştîye awan kerdî. Armancê na raştîye pergalê xo ramitiş o. Derdê kolonyalîston zî xo dewam kerdiş o.

Verba şarî eşkenê se bikerê? Heme çî ra ver ganî şarî na pergal hewl bîşinasnê. Pergal hewl tahlîl bîkerê ke verba modernîteya kapitalîst bîeşkê tekoşîn bîdê. Ma bîzanê ke hergo serre, serra verrîn ra hîna xidar vêrena. No hîş reyde ganî ma xo hadre bîkerê. Ma bîzanê ke meseleyê ke 2020î de bîyê na serre de zî do dewam bikerê. Hîna giran bîyê la sivik nêbîyê. Eke ma na vîrî reyde têgerî, ma serkewenê. Serkewtiş ma rê çîyêko asin o. Ma bîzanê ke meseleyê ke ma reyde xecîyenê ne meseleyê parîn ne zî meseleyê pêrarîn ê. Meseleyê bi serran î. Eke ma nê meseleyan raşt nêgîrê xo dest na serre zî ma tûk û tena anê vatiş. Do her çî vateyan de bimano. Ma yew game nêşonê aver. Çimkî wina ne çîyê vêreno ma dest, ne zî meseleyî çareser benê. Na çarçewe de çi keweno ma ser, ganî ma texsîr nêkerê. Çareserîya nê meseleyan ma ra vîyarena.

Ganî ma pergalê serdestî ra çîyêk nêpawê. Ganî her kes tena xora biperso. Ma dest ra, mi dest ra çi yeno? Çareyê nê meseleyan çina yê? Ganî ma nê meseleyan heme çî ra ver bi parekerdiş çareser bikerê. Çareyê şarê ma û şaranê bînan no yo.

Serra 2020 na het ra yew serra zor bî. Zurekerî teda bi şarê ma û şaranê bînan kerdî. Hema wazenê ke emsarr zî nê zurîkerîya xo dewam bîkerê. Pergalê serdestî hetê merdimîye ra çîyêk fehm nêkenê. Şaran reyde kaye kenê. Do şarî senî hewa bibî, no serdestan rê barêk nîyo. Pergalê serdestî yew krîz mîyan de yê. Wazenê ke nê kaosî ra wecîyê. Hema yew rayîr ayayî çinî yo. Çîyêk bîdê şaran zî çinî yo. Çareserîya serdestan hîna vîş qalkerdiş o, hîna vîş kiştiş o, merg o û kolonyalîstîye yo. Ma zî tena hindê pergalê serdestî bieşkê xo rayfîne se, ma eşkenê qalon înan pûç bikerê. Nîk peynîdayê na serre de zî oncina ma vateyanê verrînan qalî kenê, ma oncina lomeyan kenê û çî zî nêkeno ma dest ê wext. Bi manê weşîye reyde.



# Hirç

Welo Sinêyî ye. Sinê gundekî girêdayê navçeya Licê ya Amedê ye. Çiyayê Sinê çiyayekî pir asê ye.

Di neqebeke teng de Welo û hirç derdikevin pêşberê hev. Ne Welo dikare paşve here û ne jî hirç bi paş ve diçe.

Welo zilamekî jêhatî bû. Di herêma xwe de gelekî bi nav û deng bû.

Yek ji Welo û yek jî ji hirçê... Welhasil pev diçin. Welo hirçê dikuje, lê ew jî nîv kuştî dibe. Gundî bi vê bûyerê dihesin û bi hewara Welo de diçin, dinihêrin ku Welo di nav xwînê de maye.

Welo bi lez tînin gund. Di canê Welo de bi qasî serê derziyê cihekî bêbirîn nemaye. Welo derman dikin û dixin nav nivînan. Welo piştî hefteyekê tê ser hişê xwe.

Gundî tên serdana wî û jê re dibêjin:

De behsa şerê xwe û hirçê bike, lê ji ber ku perda guhên Welo qetiyane, deng baş naçê.

Dibêje dengê xwe bilind bikin, deng nayê min û çîroka şerê xwe û hirçê ji wan re vedibêje:

Xwedê mirovan ji hirçê biparêze. Bêxwediyê tu dibêjî qey xwariye û neriye.


Hûn nizanin ku destê wê çiqas giran e. Wexta ku şîqam li binê guhê min dixist, xwedê jî dizane ku min her carê deh stêrk bi hev re dihejmartin. De îcar çiqas bêhn dida.

Te digot qey îsal serê heft salan e ku serê xwe neşûştiye.

Welo ji gundiyan re dibêje, tembiya min li we be, heke we li cihekî hirç dît, rêya xwe biguherînin, bila mêranî ji we re be.

Piştî vê bûyerê li gund di şevbihêrkan de kê çi bigota, Welo digot qey behsa hirçê dikin û di cih de bersiva wan dida û digot: Hirç sewaleke pir xedar e; xwedê hîvza mirovan jê bike û mirovan jê biparêze. Ma ne beredayî jê re gotine hirç!

***Riza Uyar***




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe re tiştên li ba xwe binvîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-** Mamê mino mamanî
Bi şevê yar e
Bi rojê neyar e.
Kî dizane ew çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Biharan bûk e
Havînan sûk e
Payîzan pepûk e.
Hûn dizanin çi ye?

**3-**Tiştek min heye
Binî şîn e
Serî spî ye
Kulav zêrîn e.
Gelo ev çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Nivîn, Livîn
**2-** Dara fêkiyê
**3-** Nêrgiz

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De weri em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Mast û masiyê bi dasî di tasê de**
**Min mast û masî xwar**
**dasî ma di tasê de**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Min dî qurek li ser girek**
**Qurê kerê ker ker kirî**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Min girik hilkir**

***Çavkanî: Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 2 | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 | | 4 | ■ |
| | ■ | | ■ | ■ | 5 | | | | ■ | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | 7 | | 8 | ■ | ■ |
| 9 | 10 | | | 11 | | ■ | | ■ | | ■ | ■ |
| ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | 12 | | | 13 | ■ |
| 14 | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ |
| | ■ | ■ | 15 | | 16 | | | | ■ | | ■ |
| 17 | | ■ | ■ | ■ | | ■ | | ■ | ■ | 18 | 19 |
| | ■ | ■ | 20 | ■ | | ■ | ■ | 21 | ■ | ■ | |
| | ■ | 22 | | | | 23 | | | ■ | ■ | |
| | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Birayê diya mirov 3. Raz, tiştê nepen 5. Bendeman
6. Hal, dirûv 7. Kun 9. Name
12. Koka zimanê erebî û hin zimanên din
14. Çi kes, cînavek yekjimarî 15. Paytexta Tirkiyeyê
17. Cînavek di forma tewandî ya yekjimar de
18. Bersiva neyênî 22. Paytexta rojhilatê Kurdistanê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Lîstikeke berê ya zarokan
2. Kurik, her wiha celebekî stranan
3. Reşahiya mirovan a li ber tav û ronahiyê çêdibe 4. Noteke muzîkê
5. Şer, pevçûn, gotineke ji erebî derbasî zimanê me bûye 7. Kêmanî
8. Şînkaya ku zebeş û petêx lê dikevin
10. Qad, çeperê şer
11. Okyanûs, her wiha navê welatekî kendava ereban
13. Bawerî, bawermendî
14. Navê mehekê her wiha Cotmeh jê re tê gotin. 16. Cemeda ku ser avê digire
19. Arvan 20. Kar û xebat
21. Amûreke muzîkê
23. Hewa

## Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 Ç | I | 2 R | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 Î | S | 4 A | ■ |
| E | ■ | Û | ■ | ■ | 5 A | Z | A | D | ■ | Ş | ■ |
| 6 M | A | K | O | ■ | R | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | E | ■ | ■ | Î | ■ | 7 S | Û | 8 R | ■ | ■ |
| 9 H | 10 A | N | D | 11 A | N | ■ | O | ■ | E | ■ | ■ |
| ■ | R | ■ | ■ | G | ■ | ■ | 12 R | O | V | 13 Î | ■ |
| 14 R | Î | ■ | ■ | I | ■ | ■ | A | ■ | ■ | R | ■ |
| E | ■ | ■ | 15 E | R | 16 M | E | N | Î | ■ | A | ■ |
| 17 H | O | ■ | ■ | ■ | E | ■ | Î | ■ | ■ | 18 N | 19 A |
| W | ■ | ■ | 20 S | ■ | S | ■ | ■ | 21 R | ■ | ■ | V |
| A | ■ | 22 M | E | R | T | 23 O | X | E | ■ | ■ | Î |
| N | ■ | ■ | D | ■ | ■ | K | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

# Der barê êzidiyan de 2 berhemên hêja

Navenda Nûçeyan

**Weşanxaneya Sîtavê 2 pirtûk der barê êzidiyan de weşandin. Yek Dîroka Êzidiyan e ku ji alî John S. Guest ve hatiye amadekirin û ya din jî ya Eskerê Boyik 'Êzdî û Baweriya Wan' e**

Weşanxaneya Sîtavê der barê dîroka êzdiyan û baweriya wan de 2 pirtûk weşandin. Pirtûkek bi navê 'Dîroka Êzidiyan' ku ji alî John S. Guest ve hatiye amadekirin û yek jî bi navê 'Êzdî û Baweriya Wan' e ji aliyê Dr. Eskerê Boyik ve hatiye amadekirin. Wekî tê zanîn di dîroka dûvedirêj de gelê êzidî, gelek caran bi talan û êrîşên qirkirinê re rû bi rû maye.

Gelê êzidî bi baweriya xwe ya êzdayetiyê di nav dîroka xwe ya bi hezar salan de, li ser rêyeke pir dijwar meşiya û di nav astengiyên mezin re derbas bûye.

Her şaristaniyê xwestiye şaristaniya beriya xwe, her baweriyê xwestiye baweriya beriya xwe tune bike, dewsa wê bigire. Bi hatina her ola nû ya mezin re, gelek civak û gelên kevnar tevî bawerî, rê û rism, eyd û erefatên xwe (carinan heta ziman jî) di bin giranî û zordestiya wan baweriyan de pelişîne, hatine jibîrkirin.

Hinek rê û rismên kevnar ji aliyê wan ve hatine qedexekirin (hatine heramkirin), hinek jî li gorî bîr û boçûnên xwe reng û taybetmendiyên wan guhertin, kirin malê xwe. Êzdayetî jî ji wan baweriyên kevnar e ku bi qurbaniyên mezin neket nav wê pêvajoyê, bi kevnarî û xisûsiyên xwe bi serê xwe ma. Civaka êzidiyan di pêvajoya dîrokê ya bi ferman û komkujiyan dagirtî de, karibûye hem ziman û bawerî, hem li rê û rism, urf û edet, eyd û erefatên xwe xwedî derkeve û wan biparêze.

Ji wan hinek wek êzdayetiya kevnar in û ji bingeha wê ya hezaran salan tên, hinek jî di pêvajoya dîrokê de kirasê demê li xwe kirine lê dîsa bi reng, ruh û naveroka xwe li gorî taybetmendiyên vê baweriyê mane.

Êlên êzidiyan bi dewr û zemanan ji hev qetiyayî, ji hev û navenda xwe ya ruhanî dûr, dorpêça dîn dijminatiya cîranan de jiyane. Pevgirêdanên wan pir bi zehmet bûne. Zordarî, fermanên komkujiyê, rev û bez, zor û zilma dagirkerên civakî û bawerî li vê civakê kêm nebûne. Dem hebûye, ku ji tirsa dagirkeran û derdorên fanatîk nikaribûne rê û rismên xwe aşkera pêk bînin, eyd û erefatên xwe bi dizîka derbas kirine, heta nikaribûne navê xwe jî aşkera bêjin. Di vî halî de nikaribûne temamiya rê û rismên xwe bi serbestî, bi reng û rewşa wan a kevnar, di demê de, bi hev re gelemperî (civakî) pîroz bikin.


Herêmên êzidiyan ên wisa hebûne ku bi sedan salan pevgirêdanên wan çawa bi hev re, wisa jî bi navenda êzdayetiya ruhanî re nebûye. Çûyîn û hatina oldaran (qewalan) gelek bi qeziya û zehmetiyan ve girêdayî bûye. Bûyer, nûbûnên herêmekê zû negihîştine herêma din.


Çi jî hebe vê civakê karibûye bi qurbaniyên mezin, carinan jî di bin navên din de (Dasinî, Emewî) him xwe biparêze û him jî xizna rê û rism, erf û edet û eyd û erefatên xwexwetiyê yên dewlemend ji ewledan re bihêle. Eger di warê derbaskirin û pîrozkirina hinek rê û risman de cudatiyên biçûk di nav herêman de çêbûne, ew jî normal e, dem bi xwe re guhertinan tîne.

Çiqas jî ev bawerî kevnar e, dîroka wê ji kûrahiya dewranan tê, bi bûyerên trajîk û dijwar dagirtî ye lê der heqê wê baweriyê, civakê, rê û rismên wê de çavkaniyên kevn ên nivîskî, lêkolînên pêwîst pir kêm in, der heqê eyd û erefatan de bawer bikin qet nîn in. Xwendin û nivîsarî di nav êzidiyan de nebûye. Neyartiyên xurt ên li dijî vê civakê nehiştine ew bi serbestiya xwe biherike, xwe eyan bike. Êzidiyan jî rê û rismên xwe bi dizîka, dûrî çavên derdoran pêk anîne. Sira xwe li ber xelkê venekirine. Eger li ba hinek zanyarên biyanî pir an hindik di wê der heqê de behs hatibe kirin, ew jî payê pirê di rastiya xwe de dikulin.

Gelek çîrok, efsane, tekstên vê baweriyê hatine jibîrkirin. Hinek ji ber zilm û zora baweriyên cîran hatine guhertin, fikrên ku ne yên êzdayetiyê ne, ketine navê. Nimûneyên lêkolînên şûnwarnasiyê li ser erdê Rojhilata Navîn, Mezopotamyayê û Anatoliyayê, bi gilîkî ew dewletên Kurdistan di nav xwe de dabeş kirine, kîjan berê cih û warên pêşiyên kurdan (êzidî) bûne, ku karin bibin çavkaniyên girîng, ji bo lêkolîna êzdayetiyê, mixabin ew kevnarî jî heta niha ji her alî ve tên lênihêrandin, lêkolînkirin xêncî êzdayetiyê.

Dema kolana cihên arkeolojîk ên kevnar, tiştên demên berê yên gelekî kevn û hewaskar tên dîtin, nexş û sûretên li ser wan gelekan rê û rismên êzdayetiyê tînin bîra mirov. Eger bi çavê zanîna êzdayetiyê li wan kevnariyan bihata nêrîn, gelek pirsgirêkên dîroka vê baweriyê wê bihatina ronîkirin. Ev her du berhem li ser dîroka êzdiyan, her wiha li ser bîr û bawerî, eyd û erefat û urf û edetên êzidiyan e. Ev berhem ji bo nasîna civaka êzidî berhemên bêheerfpa ne.




# Lîsê 2 romanên Colemêrgî weşandin

Weşanxaneya Lîsê 2 romanên nivîskar Îhsan Colemêrgî weşandin. Colemêrgî ku berê jî gelek mijarên dîrokî ji xwe re kiribûn wekî mijara romanê, dîsa di van her du romanan de jî bûyerên dîrokî kirine mijarên romanên xwe.

Colemêrgî berê jî du romanên bi navên 'Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan' û ' Zeynel Beg' nivîsandibûn û ev roman jî xwe spartibûn bûyerên dîrokî.

Li gorî danasîn û agahiyên malpera weşanên Lîsê, nivîskar di romana xwe ya bi navê 'Ezemşêr' de behsa bûyereke di dema Osmaniyan de dike.

Îhsan Colemêrgî dikeve dû berperên dîrokê û mij û dûxanê ji ser rûdanekê radike ku bi wê rûdanê re bi qewlê Colemêrgî "serder" bûne "binder" û "binder" bûne "serder" yanî teqleke mezin li civaka mirnişîniya Hekariyan ketiye.

Di encama vê rûdana ku tê de paşayê Osmaniyan Tekelî Mehmet Paşa û Mîrê Hekariyan Ehya Beg tên kuştin, Ezemşêrê Xanî serçoçiyê vê govendê ye û bi destê wî paşayê Osmanîyan tê kuştin.


Piştî rûdanê Eşîra Xaniyan ji hev belav dibe û gundê Xanê tê kavilkirin. Îhsan Colemêrgî çirayekê bi ser vê kawdanê vêdixe û kort û kujiyên tarî yên kawdana dîroka nêzîk berbiçav dike.


Romana din jî bi navê 'Momê' çîrokeke biêş a jineke kurd e. Li zozanên Hekariyê bêbextiyek li jina bi navê Momê tê kirin û di encama wê bêbextiyê de bê guneh tê cezakirin û kuştin.

Colemêrgî vê carê berê me dide deşta Geverê û ji wê derê jî li zomê û zozana Meydanbelekê me dike mêvanê Momê û Keleşê şivan. Çîrok xwe dispêre stranekê û stran bêbextî û buxtanekê ji me re aşkera dike.

Em karin bibêjin, Colemêrgî, ketiye dû stranekê, na na çêtir e meriv bibêje daye dû zêmarekê û berê me daye milên dol û berdolên Cêloyê serî di ser ewran re; em, di ser kevîyên berfê re borandine, li şûnpêyên pezkoviyan di hisar û revzên zinar û zaxan re derbas kirine, di derî û gelîyan re em gihandine ser terazînên mêrg û kaniyên tezî, em kirine mêvanê dilê bêrîvaneke welê ku keçeke li mala bavê xwe, mîna ezîzeyekê bi qudreta xweda bi pistanên xwe berxekî sava ê li maka xwe neban, şîrmij dike, bi delalî û spehîtiya xwe keran bi guh, koran bi çav û lalan bi zar dike.

Ev şengebêrîvan bêguman Momê ye. Îhsan Colemêrgî jî me dide pê çîroka Momê û bêguman di pişt perdeya wê serpêhatiyê de, hoz û eşîrên herêmê, jiyana êl û eşîriyê û hevrikî û rakêşanên wê jî bi hostayiya xwe ya dîrokzanekî şareza raberî me dike. ***AMED***







## LMD-Kurdî hejmara 59'an derxist

Rojnameya mehane ya Le Monde Dîplomatique Kurdî, bi hejmareke nû derket. Hejmara kanûna paşîn a bi naverokeke dewlemend û bi çapa dîjîtal weşana xwe didomîne, bi hejmara xwe ya 59'an li ber destê xwendevanên kurdî ye.

Li gorî agahiyên rêveberiya LMD-Kurdî di vê hejmarê de rojnameyê rê daye gotar û analîzên wekî; 'Li Qafkasyayê pêşbaziya rûs û tirkan', 'Lîstika GO ya Çînê li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî', 'Arnawidistan, «şagirta baş» a tolaz', 'Kursa amerîkî ji bo rêveberên Çînê' û 'Rûsya li Afrîkayê, vegereke çavxapînok?' û hwd.

LMD-Kurdî, di beşa nivîsên redaksiyona kurdî de vê mehê cih daye du gotar û analîzên balkêş; Îsmaîl Beşîkçî bi sernavê "Hesasiyeta li hember destkeftiyên kurdan" û rojnamevan Çetin Çeko jî bi sernavê "Siyaseta Îsraîlê ya Kurdistana Rojava".

Her wiha, hevpeyivîna ku Jînda Zekioglu bi Prof. Hamit Bozarslan re der heqê siyaseta Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanê de çêkiriye jî balkêş e. Rûpelên xwe bi wêneyên peykersazê kurd Saleh Nemir xemilandiye. Hunermendê vê hejmarê ji rojavayê Kurdistanê ye û niha xebatên xwe yên hunermendiyê li Almanyayê didomîne.

Rojnameya bi awayê dîjîtal dertê, xwendevan dikarin bi rêya malperên medyaya civakî wê bişopînin û xwe bigihîninê. ***PARÎS***



## Li Silêmaniyê pêşangeha Zehra Dogan

Li Silêmaniyê ji aliyê komîteya jineolojiyê ve ji bo hunermend Zehra Dogan çalakiyek hunerî hat organîzekirin. Zehra Dogan di çalakiya xwe de bi çêkirina tabloya jinên hatine kuştin û li ser gora wan tu navnîşanek tune ye, bal kişand ser kuştinên jinan.

Di saetên êvarê de li kargeha Cigare ya Silêmaniyê ji aliyê komîteya Jineolojiyê û çalakiyeke hunerî ji bo hunermend Zehra Dogan hat organîzekirin.

Zehra Dogan di çalakiya xwe ya bi navê 'Şîna Xakê' de tabloyek jinên ji aliyê mêran ve tên kuştin û li ser gora wan tu navnîşanek nayên danîn, xêz kir.

Piştî çalakiyê Dogan der barê çalakiya xwe de ji çapemeniyê re axivî û got; "Şîna xakê yekem çalakiya min a hunerî ye li başûrê Kurdistanê pêşkêş dikim. Di dema pêş de ez ê li Berlîn, Mîlano û çend bajarên din ên Ewropayê jî vê berhema xwe nîşan bidim. Bi qasî mehekê ez ê li Başûr bimînim û çalakiyên xwe yên hunerî berdewam bikim."

Zehra Dogan diyar kir ku wê bi vê tabloya xwe xwest balê bikişîne ser kuştinên jinan ên ji aliyê mêran ve pêk tên. Dogan got, erka jinên hunermend e ku bi hunera xwe dengê jinan bilind bikin. ***SILÊMANÎ***



## Li Kelarê pêşangeha peykeran hat vekirin

Li navçeya Kelar a Germiyanê pêşangeha peykeran hat vekirin. Ev pêşangeh bi hevkariya rêxistina alîkariyê ya almanî û Navenda Çalakiyan a Ciwanên Kelarê hat pêşandan. Pêşangeh bi tevlêbûna berhemên hunermend Deştî Germiyanî hat vekirin.

Hunermend Deştî Germiyanî bi 20 berhemên xwe tev li vê pêşangehê bû û ev yek ji alî xelkê navçeyê ve bi têklidarî û eleqeyeke mezin hat şopandin.

Germiyanî der barê berhemên xwe de dibêje ku armanca wî ji çêkirina van peykeran ew e ku ew balê bikişîne ser hin pirsgirêkên civakî yên gel û bi taybetî jî mijara parastina jîngehê û nerazîbûna xwe ya li dijî tundiya li jinê tê kirin, bîne ziman. ***GERMIYAN***

# xwebûn

18-24 Çile 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 57

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85


# "Hevseriya çûtaxa te, li para min ket"

Hevseriya çûtaxa te, li para min ket. Îro bi dilekî şewitî û serbilind ez li vir im. Ez, zarokên min, malbata min û hûn em hemû xemgînin. Ev jêhezkirina bêdeng, piçekî be jî hêzê dide me, hezkirinek bikeder dixe dilên me.

Di încîlê ayeta 15-13'an de Johanna dibêje: "Hezkirina herî mezin ew e ku mirov di ber dost û hogirên xwe de, canê xwe feda bike."

Dostên xoşewîst, îro, nêvî ji bedena min, bavê zarokên min, mezinê malbata me û birayê we, em bi rê dikin. Bêyî ku em li çep an rastê xwe, li paş an jî pêşiya xwe kesekî bêşînin an jî bêhurmetiyê bikin, bêyî ku em sloganan biqîrin û pankartan vebikin, em bêdeng bi xwepêşandanek a rûmetê radibin. Bi vî rengê bêdengiyê, li vir, em degekî gur dikin.

Temenê wî çi dibe bela bibe, dikare 17 an jî 27 salî be, qatil kî dibe bila bîbe, ez dizanim ku ew carekê pêçekek bû. Bêyî bersiva bê ka ji pêçekekê çawa qatilek çêdibe, tiştekî em bikin nîne, gelî xoşewîstan...

Gelî xwişk û birayan, hezkirina wî ya rastbûyînê, zelalî û dostaniyê, ew anî van rojan. Cengewariya jêhezkirinê, deng bi wî xist, ew mezin kir.

Dibêjin ku ew kesekî navdar û mezin bû. Ez ji we dipirsim; ma ev mezin û navdar hatibû ser rêya dinyê? Na xêr! Ew jî mîna we hemûyan, ji diya xwe re çêbûbû. Ew ne ji asîman ji ser rûyê axê bû. Dê birize bedane wî jî wek ya me! Lê ruhê wî yê jîndewar, karê ku ew pê radibû, uslûba wî, çirûskên hezkirinê yên di çav û dilê wî de, ew mezin kiribû.

Meznayî, ji ber xwe ve, bi dest nakeve. Tiştê ku mirov pê radibe, mirovan mezin dike. Erê, wî meznayî bi dest xist. Lewra mezin hizirî, axaftina wî mezin bû. Îro bi hatina me ya vir re, em giş hêja û mezin kirin. Hûn bêdeng mezin axifîn. Hûn jî mezin in. Ranewestin, qîma xwe bi îro tenê neynin!

Îro, li Tirkiyeyê, wî mîladek saz kir. Hûn jî mohra vê mîladê ne. Bi wî re manşet, gotar û qedexe hatin guhertin. Ji bo wî çi "kozikên ziyaretan" an jî "tabû" tune bûn. Peyva wî û a dilê wî mîna hev bûn.

Wî bedelek mezin da. Pêşerojên ronî - ku bedelan dixwazin - bi hezkirina ji Hrantan û bawerî bi wan ve pêk tên. Bi kift, tajang û girtina xwînekê di ser a din re, em pêşerojên ronî nabînin...

Xoşewîstê min, ma kî dikare peyvên te ji bîr bike? Ma çi tarîtî dikare kirinên te, gotinên te ji bîra mirovan bibe, xoşewîstê min? Gelo tirs? Ma çavsorî? Ma kêf û sefaya dinyayê? Gelo mirin dê karibe ji bîra me bibe, xoşewîstê min? Na xêr, çi tarîtî nikare wan ji bîra me bibe, dildarê min.

Min jî ji te re nameyek evînê lê kir. Nivîsandina van rêzan ne hesan bû, dildarê min! Bi xêra Hisûsa, min ev peyv nivîsîn, ez deyndarê wî me xoşewîstê min. Em mafê wî, bidine wî. Em mafê her kesî bi şûn de li wan vegerînin, dildarê min.

Tu ji hezkiriyên xwe bi dûr ketî, ji zarok û neviyên xwe veqetiyayî. Tu ji yên îro hatine te bi rê bikin, bi dûr ketî. Tu ji hembêza min derketî çûyî û te welatê xwe terk nekir!

***Rakel Dink***

***Wergera kurdî/ Seyidxan Anter***
****Ev gotara Rakel Dink, hinek hatiye kurtkirin.***





Ayhan Erkmen

# Qaza Qersê navê delaliyê ye

Qaz û Qers bawer bikin, navên wan bêyî hev bên hildan kêmasiyeke mezin dê çêbibe. Serpêhatiya Qaza Qersê çîrokeke efsûnî ye. Di şeva zivistanê ya reş û dirêj de kalo pala xwe dide sobeya germ û xweş bi xweş vedibêje. Erê, dibe ku we ev çîrok li van salên dawîn bihîstibe, lê na qaz çend hezar sal in parçeyekî jiyana qersiyan e. Arkeologan di sedsala 19'emîn de di bajarê dîrokî yê Aniyê de dîzikeke 4 hezar salî dîtin û li ser dîzikê şiklê qazekê heye. Ev jî diyar dike ku di dîroka Qersê de cihê qazê cûda û girîng e. Qersî hê jî wê mîrateya pêşiyên xwe didin jiyandin û ji ber wê ye ku li ba qersiyan qaz nîşaneya hurmetdariyê ye. Dema ku yek bê mêvandariyê, gayekî bidî ber tiştek e, lê qazekê bidî ber tiştekî mezin e.

Qaz hê jî nîşaneya bedewî û delaliyê ye. Navê wê li keçikan dikin û stranan diavejin ser. Di malbata me bixwe de jî çend jinên bi navê 'Qazê' hene û wek navê xwe li bejn û bal û bedew in. Strana bi navê 'Qazê' ya dengbêjê nemir Hûseyno dibêje, strana herêma Serhedê ya sedsalî ye. Stran behsa bedewiya 'Qazekê' û eşqê dike.

*"Lê lê Qazê, wî dilê, muhubê, serê min diêşe, dilê min pêra yane yane*
*Wî de Qazê, serê min diêşe, dilê min ji bona te yane yane*
*Taxima sing û berê Qaza min alîkî deşt e yek zozan e*
*De vê subengê tê da şîn bûne gul û fîdan e serê wana li hewan e*
*Her çiyê rebê jorê binivîse jê re serê me hemiyan e*
*Her çiyê bêne serê canik û camêran hûn yeqîn bizanibin yazî muqaderata xwedan e"*

Jinên Qersê yên jêhatî û kedkar, wisa li hev tînin û qazan li ser hêkan didin rûniştandin ku bi serê biharê re çûçikên wan derdikevin. Dema ku çûçik dertên, ev jinên jêhatî çend rojên ewil, wan wekî zarokan bi şîr xwedî dikin. Peyre ji çêra teze dirûçikînin û bi çendekî bi wê xwedî dikin. Dema ku çûçik êdî bêminet dimeşin û dixwin, bi tevî diya xwe di xermana berderê malê de mehekê diçêrin. Ji wê şûndatir êdî karê qazvanan dest pê dike. Qazvan bi piranî pîr an jî zarokeke ji malê ye. Êêê min jî di zarokatiya xwe de hindik qazvantî nekiriye ha, lê bila biborînin, qaz heywanên pir ziyankar in. Dema zeviyên ceh dibînin dîn dibin, kî dikare pêşiya wan bigire û zeft bike. Pîî, em hindik ketin bela wan. Xwedê nîşan nede, dema zeviyekê didin ber xwe, bi tenê simbilên wan wisa traş dikin ku maşîne nikarin wisa bi hostayî berhev bikin. Hem jî dasiyan di firnikên xwe re diavêjin derve, şeq, şeq, şeq, şeq... şeqeşeqa devê wan e. Of! Qazvanên belengaz heya ku rojê bê teşqele derbas dikin, şîrê çend mehî di pozê wan re tê xwarê. Bi gihîştina malê, qaz ji kêfê ser zik, qazvan jî ji westandinê ser pişt dikevin.

Navê qazê min ê serkêş jî hebû. Dema ku em zar bûn xêzefîlmek hebû; lêhengê fîlmê qazê bi navê Morton bû. Ez qet ji wê fîlmê nedimam, li hemû beşên wê temaşe dikirin. Ji ber wê, min jî navê qazê xwe yê serkêş danîbû Morton. Morton li ber dilê min pir ezîz bû. Min ew bi destê xwe xwedî dikir, hin caran xwarina para xwe jî pê re parve dikir, lê ez heqê camêr jî nexwim, dema ku dengê min bi guhê wî diket, refa qazan dida dû xwe dianî. Mala minê, wexta ku min bihîst Morton bi dizî, bêyî min serjê kirine, ez pir li ber xwe ketim û min di malê de şer derxist. Min got "êdî ez sala tê naçim ber qazan", lê sala hat qazvanê malê dîsa ez bûm.

Qaz heya payîzê li gerê tên çêrandin. Bi payîzê re bîçina zeviyan xilas dibe, xerman tên kutan, cêh didin ser hev û êdî qaz tên girtin. Ji vê şûn de di hundir de bi qasî meh û nîvek, du mehan bi cêh tên xwedîkirin. Ber bi dawiya meha mijdarê ve, qaz wisa goşt digirin ku ji hîzê xwe dertên. Ew bezên nava şeqên van dadikevin erdê. Dema ku çirpiyeke zirav datînin pêşiyê, nikare di ser wê re jî derbas bibe. Di wan rojan de êdî av dicemide û berf dikeve. Qaz hema bi qasî ji cêh hez dikin ewqas jî ji berf û qeşayê hez dikin. Ne bi tenê Qazên Qersê, Kartolên Qersê û Sêvên Qaqizmanê jî heya ku şexteyê nexwin nayên berhevkirin. Erê qaz çendekî bi têra dilê xwe berf û qeşayê dixwin û ji wê şundatir êdî ji bo serjêkirinê amade ne.

Rojên serjêkirina qazan wek şahiyan derbas dibin. Malbat dor bi dor serjê dikin, keç û bûk alikariya hev dikin. Kêfa mirovan bi dengê ken, henek û stranên wan tê, lê karê ew dikin bi rastî jî ne hêsan e, di wê sermayê de pûrtkirin, ji hev derxistin û şûştina qazan pir zehmet e. Her malbatek herî kêm pazdeh, bîst qazan serjê dike, lê îja li xerîbiyê jî dost û nas hebin, ji xwe ji sedî sed hene, ew hejmar dibe sih, çil...

Ji xêncî cendekên wan; serî, ling, heta rûviyên wan jî tên xwarin. Ji bo kêfa wan bê cih û destên wan baş bixebitin dil, hundirê qazan hema li wî erdî, ji bo keç û bûkan tên qelandin. Berê bi tenê pûrta wan ji bo balîfan dihat bikaranîn, lê di van salên dawîn de êdî di endustriyê de jî tên bikaranîn. Cendekên tên pûrtkirin û şûştin bi xwêya Qulpê rind tên xwêkirin û di cihekî sar û tarî de didin ser hev û sê, çar rojan wisa disekine. Xwê wisa dike ku xwîna di cendek de maye jî kaş dike, derdixe û qazê diparêze, nahêle xerab bibe. Li pey xwêkirinê, êdî dora tav û seqemê ye. Bi qasî deh, pazdeh rojan bi serê sibê dema ku cemed dişikê, qazan derdixin ber tavê. Bi dîregên elektrîkê yan jî li cihekî bilind tên daliqandin û bi êvarê re berî ku cemed bikeve jî hildidin hundir. Ew xwê, tava zivistanê û sir û seqem wisa dikin ku wî bezê qazê bi giştî dişewite, bêhna wê hildidin û ziwa dikin, tehmeke nedîtî didin qazê. Edî qaz, ne bi tenê qaz e, panzehîr e! Wiha nebe qaz nayê xwarin, hişk e û bêhna xweliyê jê tê; yan jî dibe ku ne li gorî tehma devê qersiyan be.

Erê de ka em lê binêrin ku li gorî tehma devê qersiyan qaz çawa tê çekirin û serwîskirin. Qaz, berê tê şûştin û di nav avê de wek pênc, şeş saetan tê hiştin ku xwêya zêde lê biçe. Peyra di aveke nû de tê kelandin. Bi hinek ava wê ve xwarina destpêkê tê çekirin, ev xwarina kartolan e, kartol tên xaşilandin. Bi ava mayî ve jî savar tê çekirin. Berê tendûr dadidan, qaz li ser tendûrê dixaşilandin, nanê xwe dipetandin, li pey petandina nên jî beroşa savar bi dev vekirî datanîn binê tendûrê, qaza xaşilandî jî bi hestîfê di ser beroşê de dardadikirin û ser digirtin. Ew hilm û gulm û germahiya tendûrê qaz sor dikir, heçî bezê heyî jî diheland û rûnê wê dipaliya beroşa savar, dema savar ava xwe dikişand ji tendûrê derdixistin. Of! Êdî kî dikare qersiyan bigire. Li sifrê, pêşiyê kêmek xwarina kartolan didin, ev wek cihê girarê digire. Peyre qaz û savar; bi rastî savarê wê jî bi qasî qazê bi tehm e. Li gel wan mast û tirşîn tên ser sifrê, di dawiyê de jî xoşaf, de noşî can be.

